


## Daxwaza kurdan perwerdehî ye

Tercîha polîtîk bijarteyek e ku nêrîn û baweriyên kesane yên li ser mijarên polîtîk nîşan dide. Hilbijartinên polîtîk dikarin ji hêla gelek faktoran ve bêne bandor kirin, wekî bawerî, nirx, ezmûn û hawirdora civakî... ***Arslan Ozdemîr/R.5***



## Çarşema Serê Nîsanê

Yek ji cejnên civaka êzidî cejna Çarşema Serê Nîsanê ye. Min vê cejnê mereq kir û ez çûm gel dayikek êzidî, min jê pirsî bê ka dikare ji min re behsa erf û adetên vê cejnê bike. Dayê Neam bi kêfxweşiyek mezin... ***Eylem Şoreş/R.2***



## Ferîşteyên Mirinê

Filmê Ferîşteyên Mirinê ên Înîsherinê (The Banshess Of Inisherin ) di sala 2022'yan de ji hêla Martîn Mc Donagh ve hatiye çêkirin. Herwiha senaryo jî ew bi xwe dinivîse. Di fîlm de em bajarokekî biçûk ê giraveka... ***Mazlum Baran/R.11***

15 -21 Nîsan 2024
Hejmar: 226
Buha: 15 TL
rojname@xwebun.org

# xwebûn

xwenasîn e

## Jin li dora Rêber Ocalan dibin yek

Berdevka TJK-E'yê Ayten Kaplan der barê kampanya "Hezar Jin Yek Deng" de axivî û got ku ew bi vê kampanyayê dixwazin ku fikr û felsefeya Abdullah Ocalan belav bikin û azadiya fizîkî ya Ocalan bixwazin û wiha got: "Em dibînin ku tifaqên xwe mezin dike û têkiliyên dostanî bi qadên din ên têkoşînê re dikeve têkiliyê û hem felsefeya Rêber Ocalan dide naskirin û ji aliyê gelek derdoran ve tê qebûlkirin. Kampanyaya 1000 jin û yek deng li ser esasê pêngavê pêş ketiye. Girîngiya vê ê ew e ku yên Rêbertiyê bixwînin û paradîgmaya wî qebûl dikin, di xwe de guhertin û veguhertinê dikin." ***R.3***



## Hukmatê serokerdoxan

Hem Tirkîya hem zî Kurdistan de xeylêk şaristanan de şarî AKPyî rê "nê" vat. Netîceya weçînayîşan de eşkera bî ke rejîmê Erdoganî şaredarîyan de pergalê luks û "sefahatî" awan kerdo. Senî ke Erdoganî seba xo serayî dayî viraştene, şaredaranê AKPyî zî serayê xo viraştê. Cor ra heta cêr pêro dewlete boye dana. Seraya Erdoganî îlhamê bêrayîrîye dana. Ge-ge tirkî de vanê "Biza ke vejîyena serê dare ra bizêka/o ke bask ra ewnena/o bena/o". Mîsal şaredarîya Sancaktepe de şaredara AKPyî Şeyma Dogucu îsrafêko gird kerdo. Şêwirmendê Ekrem Îmamoglu Necatî Ozkanî pare kerd ke Dogucu qatê îdareyê xo de cuyêka lukse ciwîyaye. Uca de kulindêka girde, odayê arisîyayîşî, odayê meqamî û werdî bala merdimî anjenê. Yew zî Şeyma Dogucu seba xo "jakuzî" dayo awankerdene. ***R. 9***

### 3000 KES LI PÊŞ CPT DICIVIN

# Dê azadiya Ocalan bixwazin

3 hezar kurd û dostên kurdan ji bo CPT û Konseya Ewropayê dawî li îşkenceya li Îmraliyê bînin û azadiya fizikî ya Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan bixwazin dê bimeşin Strasbourgê û 5 rojan çalakiyê lidar bixin. Hevserokê Konfederasyona Civakên Kurdistaniyên li Almanyayê (KON-MED) Kerem Gok, têkildarî çalakiyên ku di 15-19'ê nîsanê de li Strasboûrgê li pêş CPT û KE'yê kom bibin û got: "Ev çalakiya 5 rojan a li pêş Konseya Ewropayê di pêşengiya KCDK-E'yê de tê li darxistin. Em wekî Konfederasyona Civakên Kurdistaniyên li Almanyayê (KON-MED) milekî vê xebatê ne. Em bi vê çalakiyê dixwazin berî her tiştî dengê Rêber Apo bidin bihîstin. Em dixwazin balê bikişînin ser tecrîda li Îmraliyê. Em dixwazin malbat û parêzer bi Serok Apo re hevdîtinê bikin. Bi vê armancê dê di navbera 15-19'ê nîsanê de bi tevlêbûna 3 hezar mirov çalakiya rûniştinê bê lidarxistin. Di vê çalakiyê de em ê bang li Konseya Ewropa, Parlamentoya Ewropayê û CPT bikin ku zagon û rêgezên xwe pêk bînin û têxin meriyetê. Em dixwazin mafê Serok Apo yên hiquqî têxin meriyetê...***R.3***




## Du mijarên girîng

Di rojevê de du mijarên girîng ên tirk û bi taybetî kemalîst pê har bûne û diteqin lê ji dest wan êdî tiştekî karibin bikin nayê, ji ber ku nemaye, hene: Ji van yek jê aşkerebûna derewa wan a sed salan e, ku li ser televizyonan û di rojnameyan de her dem ji bo kurdan propagandaya "Cografya kaderdir" Erdnîgarî qeder e, dikirin. Çi ji aliyê çepê tirkan ve, çi ji aliyê kurdên nezan û îslamî ve, dem bi dem li ser medyaya kurdî û ya muxalîf jî ev gotin tê kirin. Wateya gotina "Cografya kaderdir", ev e: Kurdino, hûn li ser erdnîgariyeke wisa jidayik dibin û dijîn, ku çi bi serê we ve were ew qedera we ye. Ew ji berê ve... ***Hesen Huseyîn Denîz/R.7***

## Em dixwazin şoreşekê ava bikin

Hevşaredarê Bajarê Mezin ê Amedê Dogan Hatun li ser pirsgirêkên bajêr û çareseriya pirsgirêkan axivî û got: "Dê li hemû tax, navçeyan meclis hebin. Ev meclis dê girêdayî Konseya Bajar bin. Dê hemû gel di nava pêvajoyê de cih bigire. Dema yek tenê biryar bide û bi rê ve bibe, dibe dîktator. Dema hemû gel bi hev re biryarê bide, hem çareserî hêsan dibe, hem bêtir lê xwedî derdikeve. Dê di her qadê de gel di nav xebatan de cih bigire. Kî ji bo gel û bajar xizmetek baş bike, deriyê jê re vekirîbe. Em bi hevî û bi hêz in. Ji ber ku talankirina qeyûm pir zêde ye. Di nava 10-15 rojan de kordînasyonê ava bikin...***Hevpeyvîna Mehmet Alî Ertaş R.4***

## Tecrîd îşkence ye

Ev zêdetirî 3 sal in tu agahî ji Rêber Apo nayê girtin. Rejîma faşîst a AKP/MHP'ê ku ku tifaqa xwe li ser qirkirina gelê kurd û Tevgera Azadiyê daye avakirin hewl dide bi vê pergala tecrîda li Îmraliyê îradeya gelê kurd bişkîne û teslîm bigire. Li dijî van hewldanan ne tenê li bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê li çar aliyên Kurdistanê û cîhanê gelê kurd û dostên wan di nava têkoşîne girîng û bi wate de ne. Pêngava "Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka kurd re çareserî" ku bi beşdariya gelek rewşenbîr, siyasetvan, zanyar, hunermend û lêkolîneran di 10'ê Cotmaha 2023'yan de bi awayekî hemwext li gelek navendên cîhanê hat ragihandin yek ji van xebatan e. Gelê kurd û dostên wan li dijî pergala tecrîda ku... ***Felemez Ulug /R.6***




## Amadekariya hevpeymana jinê

Heyvek, rewşa jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê piştî destkeftiyên binirx ên di Şoreşa Jinan li rojavayê Kurdistanê û giştî Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bidestxistine, ber bi guhertinan ve diçe. 11 sal ji şoreşê hêja bûn ku jin sîstema xwe ya xweparastinê, xwerêxistinkirin û xwerêvebirinê bidin avakirin. 11 sal dikarîbû bandorê li rêxistin, fikr û tevgerên jinan ên li her sê aliyê din ê Kurdistanê û cîhanê bike, Şoreşa Jinan a Rojava dikarîbû helwest û armanca têkoşîna jinan di bin siya felsefeyekê de bîne cem hev û gotina wan bike yek ew jî 'Jin Jiyan Azadî' ye. Li hemberî hişmendiya têkçûyî ya mêr ê serdest, zayendperestiya civakî, bêedaletiya cîhanî û binpêkirina mafên jinan,... ***Sorgul Şêxo /R.2***

## Şerê bi şerê taybet re

Ji bo şerê bi şerê taybet re, beriya her tiştî yekîtiya rêxistinî pêwîst e. Mirovê Zana gava dibêje, "Li Kurdistanê pelê darê bi xwe jî bê rêxistinbûyîn nikare biheje", a rast amaje bi geşedanên germegerm ên niha diqewimin jî dike. Serketina li hember polîtîkayên "dabeş bike, parçe bike, bi rê ve bibe û berî hev bide" ya îngilîzan ku em di seranserê dîrokê de rastî wê tên, bi ferdê rêxistinkirî û civaka rêxistinkirî pêkan e. Ji lew re rastî yekpare ye û parçekirina rastiyê, parçekirina mirov e ku ew bi awayekî mîkroyî gerdûn bi xwe ye. Wekî gelek caran hatiye gotin, pergala TC'ê bi temamî pergaleke şerê taybet e. Bi awayekî dîrokî rehên vê pergalê, xwe disipêrin demeke dûr û dirêj. Şervaniya taybet ku ji aliyê rêbazê ve jî gelek rêyan bi awayekî hemwext bi kar tîne, awayê şerê... ***M. Torî/R.7***

# Jinan dest bi amadekirina Hevpeymana Jinê kirin

Jinên kurd li dijî çeteyên Cebhet El-Nusra, DAIŞ û komênser bi Îran û hikûmeta Şamê ve ji bo parastina şoreşê şer kirin û têkoşîna xwe li hemberî dagirkeriya tirk heta niha didomînin, dixwazin vê ji cîhanê re dibêjin; 'Tiştên ku hûn newêrin bikin, vaye em dikin.'



Sorgul Şêxo




Heyvek, rewşa jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê piştî destkeftiyên binirx ên di Şoreşa Jinan li rojavayê Kurdistanê û giştî Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bidestxistine, ber bi guhertinan ve diçe. 11 sal ji şoreşê hêja bûn ku jin sîstema xwe ya xweparastinê, xwerêxistinkirin û xwerêvebirinê bidin avakirin. 11 sal dikarîbû bandorê li rêxistin, fikr û tevgerên jinan ên li her sê aliyê din ê Kurdistanê û cîhanê bike, Şoreşa Jinan a Rojava dikarîbû helwest û armanca têkoşîna jinan di bin siya felsefeyekê de bîne cem hev û gotina wan bike yek ew jî 'Jin Jiyan Azadî' ye. Li hemberî hişmendiya têkçûyî ya mêr ê serdest, zayendperestiya civakî, bêedaletiya cîhanî û binpêkirina mafên jinan, rêxistinbûyîna jinan tenê têrê nake, birêxistinbûyînê re pêwîstiya afirandinê heye ku her jinek dikare çalakiyeke bibandor li dar bixe, her jinek şoreşek e û her şoreşek jî di hundirê xwe de ferd û sîstemên demokratîk dihewîne. Wekî çawa dayik di hundirê xwe de jiyanê mezin dike û bi hezkirin wê diwelidîne û xwedî lê derdikeve, wiha hemû jin dikarin li şoreş û sîstema xwe jî xwedîderkevin, berhemên heyî yê xwe jî bibînin, ji ber têkoşîna parçe parçe wê encameke xurt û bihêz bi xwe re ava neke. Ji ber jin xwedî yek nasnameyê û pirsgirêka jinê pirsgirêkeke cîhanî ye.

Em niha li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê binêrin, jinên ku li hemberî çeteyên Cebhet El-Nusra, DAIŞ û komikên çeteyên ser bi Îran û hikûmeta Şamê ve ji bo parastina şoreşê şer kirin û têkoşîna xwe li hemberî dagirkeriya tirk heta niha didomînin, dixwazin vê ji cîhanê re bibêjin; 'Ha tiştên ku hûn newêrin bikin, vaye em dikin û em ê heta dawî jî bikin.' Şoreşa Jinan a ku enternasyonalîstî bû, niha gaveke din davêje, gaveke ku naşibe tu gavên wê yên berê. Îro jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê xwe ji bo çêkirina hevpeymaneke jin amade dikin. Li gorî rêveberên vê xebatê dê di nava kêmî meheke de starta vê xebatê were ragihandin. Amadekariya Hevpeymana Jinê di Hevpeymana Civakî de wekî xalekî bingehîn hatiye diyarkirin. Hevpeymana Civakî jî di 12'ê kanûna 2023'yan hatibû îmzekirin.

**Hevpeyman şoreşeke zihnî ye**

Hevpeymana Civakî dikarîbû rê ji çêkirina Hevpeymana Jinê re veke. Bêguman ev xebat dê ne hêsan be ji bo jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê. Helbet wê bi êrîşên dewleta tirk re rû bi rû were. Ji ber pergala mêr ê ku li dijî jinan êrîşên cur be cur dike wê bêax, bênasname, bêwelat û bêziman, bêçand, bêdîrok dike û ev hemû di warê pêkanîna êrîşan û koçberkirina wê re pêk tîne, dê nivîsandina Hevpeymana Jinê ku wekî pergala jinan a azadî, wekhevî û parastina mafê wê yê di warê hiqûqî û qanûnî de, qebûl neke. Nivîsandina Hevpeyama Jinê şoreşeke zihnî ye, wê jin bi pergala jinê li dijî komkujiyan were birêxistinkirin, wê nasnameya jinan êdî neyê binpêkirin û destkeftiyên wê werin misogerkirin. Bêguman avakirina pergala jinan li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, dê têkeve xizmeta jinên tevahî Sûriyeyê ku ji adara 2011'an ve di nava êrîş, qirkirin, penaberî, koçberî, îstîsmara zayendî, destdirêjî û kuştina di nav girtîgehên rejîma Baasê de ne. Avakirina sîstemeke demokratîk, azad û wekhev ku jin êdî dê bi biryarên mêran neyên darizandin, cezakirin û kuştin dê bandorê li cîhana derve jî bike. Wiha wê jinên derve jî bikaribin pergala xwe avabikin û hemû jinên çalakvan, siyasetmedar, tevger û rêxistinên jinan di bin yek konfederalîzma demokratîk a jinan de, li dijî pergala mêr ava bikin û têbikoşin.

Berî her tiştî jî divê ku jin bizanibin di vê sedsalê de divê çi bikin, çawa bikin heta ku têkoşîna wan a dehan salan bi encam bibe, ya herî girîng ew e ku jin û mêr hevdû qebûl bikin, bi hev re têkoşîna zayendî bimeşînin û hevjiyana azad pêk bînin, heta ku bikaribin derdorê jî bidin îqnakirin û hişmendiya mêr û dewletê bidin guhertin. Guhertina pergala mêr û hişmendiya dewleta hilweşiyayî misogeriya cîhaneke azad, aram û ewle bo jinan e. Ji ber wê jî gavavêtina destpêkê ya nivîsandina Hevpeymana Civakî girîng bû, ji ber Hevpeymana Civakî dibe peymana azadiya di navber jin û mêr de, ev jî dibe tovê serkeftina Hevpeymana Jinê.

**Cîhaneke ewle bo jinan rastiyeke ferz kiriye**

***Şoreşa Jin parçeyek biçûk ji cîhaneke ewle ya ji aşopiya jinan bûye rastî ye***

Dê jin hîn bêtir bi nêrîna jinên cîhanê, êrîşan, pergalên desthilatdariyê ên xwe li ser qirkirina jinan ava dike, bifikire û wiha di warê piratîkî de bi aqilê jinên zana biryaran bide. Dê li vir her tişt bibe rengê jinan.

Tu bikî nekî jî gaveke wiha dîrokî û di vê pêvajoya hesas re ku hemû pergalên mêr têk diçin, avakirina pergala jinan wê li Kurdistanê û cîhanê dengvedanekê çêbike, hîn bêtir yekîtiya jinan û hevgirtina wan xurt bike. Ji ber rastiyeke ku xwe ferz dike êdî cîhaneke jin di nav de ewle bijîn, bifikirin, bimeşin, bixwînin, tevger bikin, azad bi nêrînên xwe bijîn û bêyî saw xwe îfade bikin heye.

Şoreşa Jinê a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê parçeyek biçûk a vê cîhanê ye ku hatiye avakirin, lê gelek destên spî, qehweyî, reş û ji hemû rengan pêwîste bigihêjin hev û pergaleke wiha bidin avakirin, da ku bibe layiqî keda bi salan hatiye û tê dayin. Ji lewra girîngiyeke demildest e ku jin konfederalîzma jinan a demokratîk a cîhanê ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan pêşinyar kiriye, ava bikin û destkeftiyên xwe misogertir bikin. Aşopiyên jinan ên salan bi 'Jin Jiyan Azadî' vediguherin rastiyên jiyanî.

---

Eylem Şoreş

# Çarşema Serê Nîsanê

Yek ji cejnên civaka êzidî cejna Çarşema Serê Nîsanê ye. Min vê cejnê mereq kir û ez çûm gel dayikek êzidî, min jê pirsî bê ka dikare ji min re behsa erf û adetên vê cejnê bike.

Dayê Neam bi kêfxweşiyek mezin, me li mala xwe pêşwazî kir û me hinek wek ku êzidî dibêjin 'Galegal' kir. Dayê Neam di serî de got; ''Hinek ji vê cejna me re dibêjin 'Çarşema Sor' lê navê wê ne çarşema sor e. Çarşema serê Nîsanê ye.'' Weke dayikê jî gotiye navê Çarşema Sor esas navê cejna biharê ya zerdûştiyan e. Lê maneya Çarşemba Sor bi farsî ji bo çarşema pîroz tê bikaranîn û bi vî awayî bi ÇarşemSerê Nnîsanê dem bi dem dihat tevlihevkirin.

Dayê diyar kir ku sedema cejnê jî ev e avabûna dinyayê li gorî baweriya ezdayetî di 1'ê nîsanê de dest pê kir. Li gorî vê baweriyê qonax bi qonax giya şîn dibin, hucreyên ajalan çêdibin û piştre herî dawî mirov çêdibin. Ev qonax hemû di nava 7 rojan de temam dibin û qewla dinyayê di yekemîn çarşema meha nîsanê de bidawî dibe. Ji ber vê yekê ye meha nîsanê mehek pîroz tê dîtin.

Bes mereqa min ya ji bo cejna Çarşema Serê Nîsanê bidawî nebû û min ji dayê pirsî bê ka beriya cejnê û di roja cejnê de êzidî çi dikin. Dayê Neam ser wê wiha berdewam kir; Erf û edetên me yên êzidiyan kevnar in, destpêka salnameyê ya êzidiyan jî di meha Nîsanê de ye. Roja sêşemê em nanê ji bo miriyên xwe derdixin û amadekariyên çûyîna şehîdgehê dikin. Vê rojê hêka boyax dikin, ji ber ku hêk hem wekî şekil dişibin dinyayê hem jî hêk jî weke dinya bi heft tebeqe ne.'' Weke din êzidî dibêjin, "Cîhan dema ji tarîtiyê derbasî ronahiyê bû; ango roj dît, hingî reng pê de hat û bihar hat." Ji ber vê yekê ye hêk di Çarşema Serê Nîsanê de bi rengên biharê tên boyaxkirin. Şîroveyek din a ji bo hêka jî ew e ku zerika hekê dişibe dinyayê û spiya hekê jî îfadeya rojê dike. Bi vî awayî di roja çarşemê de avabûna dinyayê tê pîrozkirin. Weke din kulîlkên sor bi malên êzidiyan tên kirin, ev yek jî nîşaneya cejnê ye.

Dayê Neam weke din behsa duayên cejnê kir; ''Êvara çarşemê mêr û melaqe li dora heyvê dîwanê digirin û bi vî awayî dikevin sala nû. Dayikê behs kir ku her sal kesê ku duayê salê dike jî diguhere; ''Tawsî Melek reîsê melekan an jî avakerê cîhanê ye û çarşem cejna Tawsî Melek e. Ew biryar dide ku kî bibe sahîbê salê.

Nîşaneyek din a cejna çarşemê cilê spî yê êzidî ne. Di vê rojê de herkes van cilan li xwe dike û diçin serdana miriyên xwe û serdana quban dikin. Beriya ku biçin serdana miriyên xwe li gorî erf û adetên cejnê xwarin dihatin hazir kirin an jî fêqî an helawê dibin. Bi vî awayî piştî roj hilat li şehîdgehê xwarin li gel hev tê xwarin. Maneya wê jî Dayê Neam bi ruhê mirovan re şîrove kir; ''Bedena însan dibe ku tune bibe, lê ruhê wan tune nabe.'' Dayê Neam qala xewna dayikek kir ku neçû serdana diya xwe ya di cejnê de û ji ber wê dayika wê hatiye xewa wê û jê re gotiye ku bi tenê maye; ''Dibe ku însan bimirin lê ruhê wan sax e û ew dibînin. Hîna beriya roj derket milet diçe serdana miriyên xwe bi hêviya ku ruhê miriyên xwe bibînin. Em ne tenê ji bo miriyên xwe ji bo hemû kesên li wê derê veşartî ne diçin û em li vir duayan dikin.

Dayê Neam duaya xwe ya ber rojê ji bo cejnê jî bi me re parve kir;

*''Ya Şeşims, tu li êzidiyan hemû û li xêrxwazan hemû,*

*li me û zarokên me hemûyan jî birehmî.*

*Rêxistina me, gerîlayên serê çiya li hêviya te û rehma te bin.''*

Dayê Neam dema vê duayê xwe parve kir diyar kir ku duayên sibehê û êvarê ji hev cuda ne û yên ku însanek biçe ber rojê bike jî ji hev cuda ne. Kesên ku diçin ber rojê ji bo mala xwe, ji bo miletê xwe duayan dikin. Maneyek din ya danîna xwarinê ya şehîdgehê jî bi hevdû re pîrozkirina cejnê ye. Bi wesîleya cejnê weke din kesên ku ji hev xeyîdîne jî li hev tên. Êdî piştî serdanên cejnê jî, ji 7 heta 70'ê salî di hefleyan de tên ba hev û bi cilên xwe yên spî bi hevdû re govend digerînin û cejna xwe pîroz dikin.

Çarşema Serê Nîsanê li gorî baweriya Ezdayîtê di çarşema destpêkê ya meha nîsanê de tê pîrozkirin. Îro di nava civaka êzidî de tenê Feqîr û beşek ji êzidiyan vê pîroz dikin. Çarşema Serê Nîsanê li gorî gera heyv, roj û stêrkan diyar dibe. Lê di nav êzidiyan de pîrozkirina cejnê ya li gorî salnameya dewletê ya ku Baba Şêx di dema xwe de diyar kiribû de jî heye. Piranî car li gorî vê salnameyê pîrozbahiya çarşema serê Nîsanê dikeve hefteya piştî pîrozbahiya cejna Feqîran. Bi vî awayî çarşema destpêkê ji aliyê tebeqeya Faqîran û çarşema duyemîn jî bi giştî êzidiyên Şengalê bi hev re pîroz dikin.

***Em jî Çarşema Serê Nîsanê li tevahî civaka êzidî pîroz dikin.***



# Dê 5 rojan paradîgmayê niqaş bikin

## 3 hezar kurd û dostên kurdan dê di navbera 15-19'ê nîsanê de li Strasboûrgê di çarçoveya pêngava ji Abdullah Ocalan re azadî ji pirsgirêka kurd re çareserî çalakiya rûniştinê li dar bixin

Sosin Gulo

Hevserokê Konfederasyona Civakên Kurdistaniyên li Almanyayê (KON-MED) Kerem Gok, têkildarî çalakiyên ku di 15-19'ê nîsanê de li Strasboûrgê li pêş Konseya Ewropayê bên lidarxistin nirxandin kir. Hevserokê KON-MED'ê Kerem Gok anî ziman ku ev çalakiya 5 rojan a li pêş Konseya Ewropayê di pêşengiya KCDK-E'yê de tê li darxistin û wiha got: "Em wekî Konfederasyona Civakên Kurdistaniyên li Almanyayê (KON-MED) milekî vê xebatê ne. Em bi vê çalakiyê dixwazin berî her tiştî dengê Rêber Apo bidin bihîstin. Em dixwazin balê bikişînin ser tecrîda li Îmraliyê. Em dixwazin malbat û parêzer bi Serok Apo re hevdîtinê bikin. Bi vê armancê dê di navbera 15-19'ê nîsanê de bi tevlêbûna 3 hezar mirov çalakiya rûniştinê bê lidarxistin. Di vê çalakiyê de em ê bang li Konseya Ewropa, Parlamentoya Ewropayê û CPT bikin ku zagon û rêgezên xwe pêk bînin û têxin meriyetê. Em dixwazin mafê Serok Apo yên hiquqî têxin meriyetê.



**Kurd û dostên kurdan hene**

Kerem Gok bal kişand ser pêkhateyên 3 hezar kesên tev li çalakiyê bibe û wiha axivî: "Hemû sazî û dezgehên kurdan in. Di nav de tevgera jin, ciwan, dîplomasî, çand, ziman, elewî û hemû pêkhateyên çar parçeyên Kurdistanê hemû rengên kurdan li wir in. Dostên kurdan jî li wir in. Bi pêşengiya Defen Kurdistan (Sîwana Parastina Kurdistanê) de bi dehan sazî hene. Women Kurdistan (Parastina Jinên Kurdistan) heye. Parêzer, akademisyen, wênesaz, wêjekar, nivîskar, nûnerên sendîkayan hene. Di 10'ê Cotmehê de li 74 navendan pêngavê dest pê kiribû. Dostên kurdan ku tev li pêngavê bûbûn dê beşdarî vê çalakiyê bibin.

Kerem Gok, bal kişand ser hejmara 3 hezaran û wiha lê zêde kir: "Li qada ku em çalakiyê lê pêk tînin gelek sazî û dezgeh hene. Lê destûr nadin ku em li wê qada çalakiyê lê li dar dixin, em bi girseyek mezin li wir çalakiyê pêk bînin. Ew der navenda Yekîtiya Ewropayê (YE) ye. Em dikarin girseyek mezin jî arasteyî wir bikin. Lê ev meseleyek dîplomasiyê ye.

**Em ê heqîqetê ji cîhanê re bêjin**

Kerem Gok li ser bernameya 5 rojan jî rawestiya û ev agahî dan: "Em ê di wan 5 rojan de hewl bidin heqîqeta Rêber Apo bi rêya çapemeniyê bi cîhanê re parve bikin. Dîsa bi kesên muxatab re parve bikin. Em dixwazin heqîqeta Rêber Apo bi civaka cîhanê re parve bikin. Kesên li wir nivîskar, akademisyen, hunermed û rewşenbîran re parve bikin. Dê li vir li ser jineolojî, ekolojî û paradîgmaya Rêber Apo de niqaş bên kirin. Dê li ser pergala jiyana alternatîf niqaş bên kirin. Li ser paradîgmaya Rêber Apo dê bername bên lidarxistin. Kesekî xwedî vê paradîgmayê girtîgeh heq kiriye an na. Tecrîdê heq dike an na dê bê niqaşkirin. Dîsa li ser mijara 'Çima tecrîd heye? Çima divê tecrîd bê şikandin' dê niqaş bên kirin. Roja herî dawî dê bi bangawaziyê bi dawî bibe.

**Em dixwazin tecrîd bi dawî bibe**

Kerem Gok bal kişand ser xebatên dîplomasiyê jî û wiha got: "Îro em bi kêre hevdîtin çêdikin, divê rast e hûn mafdar in. Lê em dixwazin vê mafdariya xwe di pratîkê de bibînin. Divê ev tecrîd bê şikandin. Li ser vî esasî di warê dîplomasî û lobî de em ê têkiliyên nû û xebatên nû bidin pêş xwe. Em ê di van dosyayên ku em pêşkêşî Konseya Ewropa û Yekîtiya Ewropayê bikin de bixwazin ku zagon û qanûnên xwe têxin meriyetê. Em tiştekî zêde jiwan naxwazin. Em ê bixwazin zagonên xwe pêk bînin, erk û peywirên xwe pêk bînin.

Rêber Apo 25 sal in girtî ye. Mafê wî yê heviyê heye. Di çarçoveya mafê heviyê de divê serbest bê berdan. Di aliyê hiqûqê de jî bi milyonan kesan bi îmzeyan vîna xwe diyar kirine. Gotine ev vîn û rêberê min e. Di mîtîngan, 8 û 21'ê Adarê de bi milyonan kes li Rêber Apo xwedî derketin. Bi milyonan kesan li qadan gotin Rêber Apo nûnerê min e. Vîna milyonan kesan ku di nava çar dîwaran de bê hiştin ne li gorî hiqûq û mafên mirovan e. Ne li gorî hiqûq, sinc, zagon û mafê jiyanê ye. Li gorî hiqûqa şer jî nayê qebûlkirin. Hemû hiqûq vê yekê red dikin. Zilmek e mezin li ser gelê kurd heye. Tecrîda li ser Rêber Apo li ser zarok, ciwan û her çar parçeyên Kurdistanê ye. Ev tecrîd rê li pêş alozî û kaosa şer vedike.

Gok bal kişand ser nêzîkatiya dostên kurdan a çalakiyê jî û wiha bi dawî kir: "Dostên kurdan diyar dikin ku dema hevdîtin pêk tê, alozî, qeyran bi dawî dibin. Dibêjin ev mirov alîgirê aştiyê ye, ne alîgirê şer e. Dibêjin çima nahêlin hevdîtin bê kirin. Li ser vê mijarê matmayî mane. Wate nadin vê yekê. Dibêjin kesên dixwaze xizmeta aştiyê bike NATO û Tirkiye çima dengê wî qut dike. Ji ber vê yekê bertekên wan pir zêde ne. Ji ber hiqûq tê binpêkirin pir bi hêrs in. Heta Rêber Apo azad nebe û pirsgirêka kurd bi rêya siyasî çareser nebe, dê çalakî û têkoşîna me bidome."

---

Gabrîel Başo

# Dixwazin felsefeya Ocalan li cîhanê belav bikin

Berdevka TJK-E'yê Ayten Kaplan der barê kampanya "Hezar Jin Yek Deng" de axivî û got ku ew bi vê kampanyayê dixwazin ku fikr û felsefeya Abdullah Ocalan belav bikin û azadiya fizîkî ya Ocalan bixwazin

Di pêşengiya TJK-E'yê de kampanya "Hezar Jin û Yek Deng" hatiye destpêkirin. Têkildarî kampanyayê Berdevka TJK-E'yê Ayten Kaplan diyar kir ku di 10'ê Cotmeha 2023'an de dostên kurdan ên biyanî û bi taybetî 3 sendîkayên mezin ên Ewropayê bi tevlêbûna gelek akademîsyen û rewşenbîr û nûnerên rêxistinên civakî, pêngava "Ji Abdullah Ocalan re azadî , ji pirsgirêka kurd re çareseriya siyasî" dan destpêkirin û wiha got: "Me jî wekî tevgera jinên Ewropayê hem piştgirî da vê pêngavê û hem jî pêşengiya vê pêngavê kir. Ji bo ev pêngav bi ser bikeve û bigêje armanca xwe em wekî tevgera jinan di nava xebatan de cih digirin. Ji bo qonaxa yekemîn a pêngavê pêş bikeve me bi gelek çalakiyên cuda û xebatên cuda kirin. Di qonaxa duyemîn a pêngavê de jî em ê bi gelek xebatên cuda piştgirî û pêşengiya wê bidomînin."

Ayten Kaplan da zanîn ku Abdullah Ocalan bi fikr û ramanên xwe ji bo jin xwe nas bikin û di nava civakê de rola xwe bilîzin rê li pêşiya wan vekir û wiha axivî: "Bi fikr û ramanê xwe hişt ku jin karibin pêşengiyê bikin û xwedî li vîn û hebûna xwe xwedî derkevin û karibin bêtir têbikoşin. Ji bo jin bibin xwedî vîn û betir têbikoşin qadek vekir û bingehek ava kir. Niha jî jin ji bo vê bingeha hatiye avakirin baş binirxînin û xwe bi rêxistin bikin, vîna xwe xurt bikin û bêtir li nirx û hebûna xwe xwedî derkevin, karibin çawa bijîn divê bêtir di nava pêngavê de cih bigirin."

**Jin pêşengiyê dikin**

Kaplan da zanîn ku di qonaxa duyemîn a pêngavê de felsefeya "Jin Jiyan Azadî" derbasî pêngava felsefeya jiyanê bûye û wiha berdewam kir: "Êdî jin bûye xwedî vîn. Êdî bûye jiyan. Jin edî bi her awayî pêşengiya guhertin û veguhertinê dike. Bi perspektîfa Jin Jiyan Azadî pêşengiyê dike û pirsgirêkan çareser dikin. Li çand û nirxên xwe xwedî derdikeve. Bi zanebûn û bi hêz li dijî bişaftinê û komkujiyê têdikoşe. Jin êdî bi felsefeya Rêbertiyê dikarin jiyana xwe bi rêve bibin û xwe bi rêxistin bikin. Dizanin ku jiyanek çawa dixwazin û çawa xwe azad bikin."

**Jin Jiyan Azadî li cîhanê belav bû**

Ayten Kaplan bilêv kir ku jina kurd bi drûşmeya Jin Jiyan Azadî hat naskirin û ev felselefe li cîhanê belav bû. Jin di her qadê debû xwedî rol. Jin jiyan azadî bi serhildana Rojhilat êdî bû gerdûnî. Hemû jinên cîhanê êdî li vê dirûşmeyê xwedî derdikevin. Jinên cîhanê êdî bêtir jinên kurd fam kirin û nas dikin."

Kaplan anî ziman ku gelek mafên jinan ji aliyê hêzên hegomonîk û kapîtalîst tên binpêkirin û wiha pêde çû: "Hêzên hegomon û kapîtalîst her tim dixwazin bi gotinên nijadperest û îslama siyasî dixwazin jinan ji hemû mafê wan dûr bixin û ji mafê wan bêpar bihêlin. Dixwazin jinan ji her qadên jiyanê dûr bixin û mafên wan ji destê wan bistînin. Pergala kapîtalîst bi polîtîkayên olî û nijadperestî dixwaze li gorî xwe rolekî li ser jinan bar bike. Ji bo ku jin nebe xwedî vîn serî li gelek rêbazan didin. Ev pergala serdest her tim dixwaze mêr li ser jinan serwer be."

**'Felsefeya Rêber Apo qebûl dikin'**

Ayten Kaplan bal kişand ser têkoşîna jinên kurd û got: "Em dibînin ku tifaqên xwe mezin dike û têkiliyên dostanî bi qadên din ên têkoşînê re dikeve têkiliyê û hem felsefeya Rêber Ocalan dide naskirin û ji aliyê gelek derdoran ve tê qebûlkirin. Kampanyaya 1000 jin û yek deng li ser esasê pêngavê pêş ketiye. Wate û girîngiya vê kampanyayê ew e ku yên Rêbertiyê bixwînin û paradîgmaya wî qebûl dikin, bi paradîgmaya wî di xwe de guhertin û veguhertîgê dikin. Vê yekê jî bi derdora xwe de parve dikin. Em di serî de bi jinên ku fikrên Rêber Ocalan dixwînin û qebûl dikin bi wan re vê xebatê dimeşînin. Piştî li gelek welatên cîhanê semîner û panelên li ser paradîgmaya Rêber Apo hatin lidarxistin, jinên ku felsefeya wî ecibandin li vî dengî kom dibin. Me xwest nîşan bidin ku Ocalan ji bo jinan tê çi wateyê? Hezar jin li dora felsefeya Rêber Ocalan bibin yek deng.

**'Dixwazin Rêber Apo bidin jibîrkirin'**

Kaplan, da zanîn ku zêdeyî3 salin tecrîrek giran li ser Rêber Ocalan heye û wiha dirêj kir: "Ev tecrîd bi taybetî ji aliyê pergala faşîst a Tirkiyeyê ve vegeriya ye îşkenceyê. Em dibînin ku ev bi piştgiriya dewletên ku bûne şirîkê komplo pêk tê. Malbat û parêzer nikarin biçin hevdîtinê. Ev bi temamî li dijî hiqûqê ye. Bi vê yekê dixwazin Rêber Ocalan bi gelê kurd bidin ji bîr kirin. Em bi vê kampanyayê diyar dikin ku feraseta ku tecrîdê pêş dixe red dikin. Feraseta ku dixwaze nivîs, deng û fikrên Rêber Apo bide ji bîr kirin em wê red dikin. Ji bo tecrîd bi dawî bibe jî têkoşîna me dê bidome."

**Felsefeya Abdullah Ocalan jiyanî ye**

Kaplan, anî ziman ku paradifmaya Rêber Ocalan li dijî pergala kapîtalîst a ku şer û serweriyê dixwaze, felsefeyek jiyanî û alternatîf e û wiha bi dawî kir: "Ji bo ev felsefe têkeve jiyanê jî divê bê nasandin û divê em li vê felsefeyê xwedî derkevin. Divê kesên vê felsefeya alternatîf zanin, ji kesên nizanin re bêjin. Divê bêjin ku kesekî xwedî vê felsefeyê çima 25 sal in di bin tercîdê de tê girtin û li dijî vê yekê hişyariyê pêş bixin. Divê bê gotign ku ji bo hemû gelê cîhanê xwedî paradgmayek alternatîf e. Pergal dixwaze Rêber Ocalan û paradigmaya wî ji hafiza me bibe. Ji bo em dîsa li vê felsefeyê xwedî derkevin divê em vê felsefeyê belav bikin. Divê em bînin ziman ku hebûna Rêber Apo sedema hebûna me ye. Jiyana Rêber Apo sedema jiyana me ye.

**Çareserî bi azadiyê pêkan e**

Divê em bînin ziman ku hêzên navdewletî yên tev li komplo bûne berpirsiyarê tecrîdê ne û divê ji bo dawî li tecrîda 25 salan bînin, gavên çareseriyê bavêjin. Çareserî bi azadiya Rêber Apo pêkan e. Divê demildest azadiya fizîkî û hemû mafên wî yên jiyanê paşve bidin. Ji ber ku Rêber Ocalan ji bo jinan xwedî rol û ristek girîng e, me ev kampanya da destpêkirin. Ev kampanya didome. Me sînorek diyar nekiriye. Em ê bi niqaşan vê kampanyayê bêtir dewlemend bikin. Em ê bi panel û çalakiyên cuda vê kampanyayê mezin bikin. Em ê di qonaxa duyemîn de bêtir fikrên jinan ên der barê Rêber Ocalan de bigirin. Hedefa me ew e ku em felsefe û fikrên Rêber Ocalan belav bikin û bînin ziman ku çima divê Rêber Ocalan azad bibe ye. Em bi vê kampanyayê tînin ziman ku ev bêhiqûqiya ku hemû mafê Rêber Apo ji destê wi digirin tu carî qebûl nakin. Di heman demê de em diyar dikin ku li dijî şer û ji bo aştiyê gelek alternatîf hene."



EM DIXWAZIN ŞOREŞEKÊ AVA BIKIN

# Ji bo xizmetê em ê li kolanan bin

■ Mehmet Alî Ertaş

*DEM Partiyê di hilbijartina 31'ê adarê de ji sedî 5.7 deng stend û 75 şaredarî bi dest xist. Li Amedê ji sedî 64 deng stend û 13 navçe bi dest xist. Gelê kurd tevî hemû lîstik, hîle û qeyûman jî dîsa li vîna xwe xwedî derket û şaredariyên xwe paşve stendin. Hevşaredarê Bajarê Mezin ê Amedê Dogan Hatun li ser pirsgirêkên bajêr û çareseriya pirsgirêkan axivî. Hevpeyvîna bi Dogan Hatûn re wiha ye:*

***Hûn li gund û navçeyan geriyan. Daxwazên gel çi bûn? We pirsgirêkên çawa tespît kirin?***

Di serî de hemû gelê me yên piştgirî dan ez spasiya wan dikim. Em ê dîsa herin ber deriyê wan û spasiya wan bikin. Çawa wekî beriya hilbijartinê me xebat meşand, em ê bi wê tempoyê dîsa gund bi gund û navçe bi navçe li gelê xwe vegerin. Piştî 8 salên şaredariyê di nav gel de hevî nemabûn. Gelek kesan digot; 'Dê dîsa qeyûm were' pir kesan digot; 'Hilbijartin êdî bêwate ye'. Bawerî ji hilbijartinan nebû. Lê em ji xwe bawer bûn û gel jî ji partiyê bawer bû. Gel digot; 'Kes ne girîng e. Em li pey partiya xwe ne. Divê çareserî ji van qeyûman re bê dîtin'. Me jî tenê peyvek digot. Çareserî yek e. Çawa roja em diçin ser sindoqan li dora partiyê kom dibin, dema qeyûm hat jî em li dora şaredariyê kom bibim. Wê demê qeyûm nikare bê. Her tişt girêdayî xwedîderketinê ye. Agirî û Wan minakê vê ye.

***Li navçeyên dervê bajar xebatek çawa hat kirin û we çi dît?***

Me bêtir giranîya xwe da ser 13 navçeyên derveyî bajêr. Di şaredariyên bajarên mezin de bêtir ji bo navenda bajar xebat tên kirin. Lê navçeyên dervê bajêr jî tên paşguhkirin. Wekî hêsîran dimînin. Me bêtir xebat li gund û navçeyan meşand û me ev feraset şikand. Nêzî hezar 500 gund û mezra yên Amedê hene. Em li tevan geriyan. Bi qasî tiştên me dît, hîn gelek gundên me bê av in. Hin gundên me rêyên wan tune. Mafê avê di şerê cîhanê de tê parastin. Mafê jiyanê ye. Me di xebatan de navê hemû gund û navçeyên ku pirsgirêkên wan hene di dosyayekê de kom kir. Me pirsgirêk di cih de tespît kir. Me got eger av li gundan tune be ev kêmasî ya me ye. Me plansazî û proje li gorî wê amade kiriye. Niha di aliyê aboriyê de gelek pirsgirêk hene. Di serî de navçeyên me yên derve nikarin debara xwe bikin. Cotkar û rençberên me nikarin çandiniyê bikin. Lîtreya mazotê hatiye 45 tl. Kesekî çandiniyê bike kar û zirara wî hev dernaxe. Zirar zêdetir e. Ev bi xwe re koçberiyê pêş dixe. Em ê vê pirsgirêkê çareser bikin. Me li ser çareseriyê 3-4 rê û rêbaz dîtiye.



Hevşaredarê Amedê Dogan Hatûn diyar kir ku ew ê ji bo xizmetê li kolanan bin û got: "Dema mirov bixwaze dikare her tiştî çareser bike. Em dixwazin şoreşekê ava bikin."

Em ê bi gel re parve bikin û bi gel re çareser bikin. Em ê koperatîfan ava bikin. Pergala wê amade kirin. Em ê li gorî nifûs û zeviyên gundan traktoran hîbe bikin.

***Li Tirkiyeyê gel çawa nêzî şaredariyan dibin?***

Li hemû bajarên Tirkiyeyê şaredarî wekî ku ji bo gel bûne cihê kar. Divê êdî gel ji bandora şaredariyan derkeve. Divê karibe xwe bi rê ve bibe û mûxtacî tu kesên din nebe. Em ê li ser vê perspektîfê tev bigerin. Li bajar dema koçberî zêde dibe, nifûs zêde dibe û kar kêm dibe. Ev dibe pirsgirêk.

***Qeyûm tabloyek çawa li pey xwe hişt?***

Dema di salên 1999'an de me nû şaredarî xist destê xwe û niha dibişe hev. Wekî li talanê bixin. Wê demê koltixa maqam jî biribûn. Niha jî wisa ye. Wekî fizîkî koltux nebirine. Lê tenê çar dîwar ji me re hiştine. Ji bo dema em hatin wir em mûxataban nebinin. Kesên mûxatab tev derketine destûrê. Niha me ji hemû navçeyan û yekîneyan yek bi yek rapor xwestiye. Piştî me mazbata girt, cejn ket navberê. Kesên ku mejiyên wan wekî mejiyên qeyûm bin, em ê yek bi yek tespît bikin û ji kar derxin. Em ê li şûna wan hevalên ku karibin vê pêvajoyê bi rê ve bibin bi cih bikin. Em ê berpirsiyariyê bidin wan. Kordînasyonê ava bikin. Ji bo em xizar û zirarê tespît bikin em ê komîsyonek nû ava bikin. Me bang li parêzerên xwe jî kir. Me berpirsiyarî da wan û dê xebatên ji bo gel nehatiye kirin tespît bikin. Eger berjewendiyên gel pêşkêşî kesên din kiribin emê îtîraz bikin. Di van 8 salan de kijan saziyên girêdayî şaredariyê hîbe kirine û dane ên din em ê tevan tespît bikin. Dîsa di aliyê aborî de butçeya me çi ye em ê tespît bikin. Çawa ku mesayî dest pê bike em ê venêrtina hundir bikin û tespîtan bi gel re parve bikin. 21 serokên daîreyan hene. Em ê raporan ji tevan bixwazin. Çi kar û xizmet kirine divê parve bikin. Ji bo pênûsekê jî pere xerç kiribin em ê fatûreyên wan bixwazin.

***Niha çiqas deyn heye?***

Yekîneya Karê Maliyê agahiyeke teqez neda me. Li gorî wan, di 3-4 mehên dawî de pir zêde îhale dane. Nêzî 2-3 milyar îhale dane. Em ê lêpirsîna wan bikin. Piştî hemû rapor bi tevahî hatin, em ê lêkolîn bikin. Ku rantek, talanek hebe em ê tespîlî parêzeran bikin û dozê li wan vekin. Em ê yek bi yek bi gel re jî parve bikin. Di 6 mehên dawî yên hilbijartinê de divê xebat neyên kirin. Lê di roja dawî de biryara meclisê girtin. Em ê pênûs bi pênûs rapor bikin û bi gel re parve bikin. Hem li Kurdistanê û hem li hemû Tirkiyeyê gel birçî hiştine. Dixwazin gel bi birçîbûnê terbiye bikin. Îro heqê etûrekî di berîka gel de tune. Feqîr tam feqîr û zengîn tam zengîn kirine.

***Ji bo kesên feqîr û xizan hûn ê çi bikin?***

Me lêkolîn kirine. Di serî de ji bo taxên feqîr ku nikarin nan bibin malê, em ê malên xwarinê ava bikin. Me hin tax tespît kirine. Bi rastî gelê me birçî hatiye hiştin û birçî radizên. Lê vê yekê ji bo xwe nake pirsgirêk. Yên herî zêde li partiya xwe xwedî derdikevin jî ew in. Em ê li 6-7 cihan malên xwarinê ava bikin. Bila zanibin ku em ji bo gel hatine. Em ê li gelê xwe xwedî derkevin. Heta ku hemû navçe meclîsê xwe avabikin, Şaredariya Bajarê Mezin jî dê meclisa xwe ava bike û dest bi xebatan bikin. Em ê xizmetê li navçeyên ku me qezenç nekirine re jî bikin. Hemû gelê me ye. Di serî de li ser çandiniyê û pîşesaziyê plansaziyên me hene. Hem ax û hem jî axa Amedê pir dewlemend e. 12 hezar sal in jiyan li Amedê qut nebûye. Ji ber ku gel li ser vê axê têr dibe. Ax û ava wê dewlemend e. Ava çemê Dîcleyê pir dewlemend e. Lê mixabin herî kêm Amed jê sûdê digire. Plansaziyên me ji bo vê yekê hene.

***Hûn ê paradigmaya partiyê çawa têxin meriyetê?***

Di aliyê teori û zanînê de pirsgirêk tune. Em nikarin di rojekê de hemûyan têxin meriyetê. Gav bi gav em ê têxin meriyetê. Binesaziya wê heye. Di nava partî û gel de mejiyê rêveberiya xwecihî û koperatîfan heye. Karê me ne zor û zahmet e. Niha pirsgirêk kordînasyonên me ne. Dema kes girtine kar, bi awayekî fermî girtine û tu nikare careke din wan biguherîne. Dema em ê kordînasyonan ava bikin, em ê dest pê bikin. Di aliyê saziyên jin, ciwan, çand, ziman û perwerdehiyê de binesazî heye. Em kengî bixwazin em dikarin dest pê bikin.

***Proje û bernameyên ji bo zarok û ciwanan çi ye?***

Li Amedê nêzî 300-350 hezar ciwan hene. Nifûsek gelek zêde ye. Çima ciwan ji navçeyan tên nava bajêr. Ji ber ku navçeyên me yên derve ciwanên xwe têr nake. Ji ber kar û karsazî li wir tune ciwan koçber dikin. Ji axê dûr ketine. Mejî û hafizayek heye. Em ê bernameyên berê û saziyên berê nûjen bikin. Zimanê bajar muhîm e. Di aliyê derûnî de bandor li ser gel heye. Dema mirov nikaribe xwe bîne ziman moral xera dibe. Lêkolîn kirine. Di nava 81 bajaran de bajarê herî moralê kêm e Amed e. Tesîra ziman û çanda din li ser zêde ye. Çavkaniya jiyanê qut kirine. Divê beriya her tiştî em ji hev hez bikin û bi moral bin. Em bawer û bi biryar im temam e. Îro ciwanên me ji ber xizanî û betaliyê tev li karê hişbirê dibin. Êdî tiştên kîmyewî bikar tînin. Bi taybetî li taxên xizan zêde ciwan hişbirê bikar tînin. Em ê pêşî ciwanan ji hişbirê xelas bikin. Em ê ciwanan di her qadê de bi cih bikin û bikin xwedî vîn. Em ê ciwanan tev li hemû xebatan bikin. Ciwanên me li ku ji dayik bûne, divê li wir têr bibin. Em ê di aliyê teknolojiye de jî xebatan bikin. Cîhan di kîjan astê de ye, em ê bajarê xwe jî bînin wê astê.

***Saziyên civakî dê rolek çawa bilîzin***

Em ê dîsa Konseyên Bajaran ava bikin. Dê li hemû tax, navçeyan meclis hebin. Ev meclis dê girêdayî Konseya Bajar bin. Dê hemû gel di nava pêvajoyê de cih bigire. Dema yek tenê biryar bide û bi rê ve bibe, dibe dîktator. Dema hemû gel bi hev re biryarê bide, hem çareserî hêsan dibe, hem bêtir lê xwedî derdikeve. Dê di her qadê de gel di nav xebatan de cih bigire. Kî ji bo gel û bajar xizmetek baş bike, em deriyê xwe lê nagirin. Em bi hevî û bi hêz in. Dibe ku di 10-15 rojan de hinek dereng bikeve. Ji ber ku talankirina qeyûm pir zêde ye. Em ê di nava 10-15 rojan de kordînasyonê ava bikin.

***Bername û plansaziyên we ji bo jinan çi ne? Hûn ê paradigmaya hevşaredariyê çawa pêş bixin?***

Roja ewil ez û Serra hatin cem hev. Me got hemû civak û Kurdistan li me dinere. Hewce ye em pêşengiya vê pergalê bikin. Di serî de divê em her du li paradîgmayê xwedî derkevin. Hevala Serra gelek pêşketî ye. Mejiyê mêr di hemû mêran de ye. di min de jî heye. Lê ji bo em vê ferasete rast bikin çi ji destê min bê ez ê bikim. Me soz daye, li ku kêmasî hebe, em ê wê kêmasiyê temam bikin. Di serî de divê mejiyê mêr bê guhertin. Heta mejiyê mêr bê guhertin em ê pêre têbikoşin. Têkoşîna jinê di civaka me û mêr de guhertinek çêkiriye. Gel êdî têkoşîna jinê qebûl kiriye. Jina kurd di her alî de xwe îspat kiriye. Lê divê mêr xwe biguherîne. Ew jî di destê me de ye. Divê jiyana hevpar bê famkirin. Ez ê ji xwe de dest pê bikim. Di plansaziya me de muzeya jinan heye. Em ê muzeya jinan vekin. Jinên di Rojhilata Navîn de li ber xwe dane û bûne malê dîrokê. Em ê li hemû cîhanê lêkolîn bikin û jinên bûne sembol em ê muzeya wan vekin.

***Xebatên we yên ekolojiyê çi ne. Hûn ê ji bo ekolojiya bajar tiştekî çawa bikin?***

Ekolojî ne tenê xweza û parastina xwezayê ye. Ekolojî di hundirê jiyana mirov de ava dibe. Bi xwezayê re jiyanek hevpar e. Divê ekolojî di hemû kar û saziyên me de hebe. Dema em bi xwezayê re bijîn, xweza çiqas mirovan têr dike, divê mirov jî xwezayê têr bike. Bajar jî wisa ye. Trafîka Amedê jî kes lê xwedî derneketiye û kesî ji bo xwe nekiriye derd. Divê plansaziya rêgehan bê kirin. Lê pirsgirêka herî mezin bajar êdî têra erebeyan nake. Erebe pir pir zêde bûne. Divê êdî mirov karibe hinekî bimeşe. Divê êdî duçerxan bikar bîne. Hem meş û hem duçerx ji bo tenduristiya mirov baş e. Divê hin qad jî li erebeyan bê astengkirin. Mirov erebeyên xwe li malê bihêle û erebeyên şaredariyê bikar bîne. Êdî pêdivî bi tramvayan jî heye. Di dema Osman Baydemîr de proje amade kir. Lê Wezîrê Xezîneyê pere neda. Niha di plana me de jî heye. Em ê li rê û rêbazan bigerin.

***Têkiliyên we û gel li ser çi esasî pêş bikevin?***

Gel vîna xwe dixwaze. Em ê di serî de gundên bê av, rê û bê binesazî mane ziyaret bikin. Em ê dî her tim li derve min. Em ji bo qoltixê nehatine. Em ê yek bi yek li tevahiya gundan bigerin. Em ê ji bo xizmetê li kolanan bin. Mînak Pîran di nava du bendavan de ye. Lê ava wê tune. 3 dewlet jî wê avê sûdê digirin, lê ev navçeya me ji avê sûdê nagirin. Ev şerma me ye. Em ê vê yekê bişkînin. Ava gundê binê Zerzewanê birîne û dane Keleha Zerzewanê. Gund bê av dihêlin û didin kelehê. Dikarin depoyek mezin ava bikin û çareser bikin. Dema mirov bixwaze dikare her tiştî çareser bike. Em dixwazin şoreşekê ava bikin. Axa me û ava me dewlemend e. Em axa xwe bajon em ê dinyayê têr bikin.




## Dogan Hatûn kî ye?

Li navçeya Pasûrê ya Amedê ji dayik bû. Perwerdehiya Endezyariya Madenê stendiye. Di salên 2016-2023'yan de bû Hevserokê Odeya Endezyarên Madenê ya Amedê. Di salên 2018-2022'yan de sekreteryaya Lijneya Koordînasyona Bajar a TMMOB'ê ya Amedê kir. Bû berdevkê Platforma Ked û Demokrasiyê. Di hilbijartina 31'ê Adarê de bû namzetê Hevşaredariya Bajarê Mezin a Amedê yê DEM Partiyê. Di hilbijartinê de bi ser ket û bû Hevşaredarê Bajarê Mezin ê Amedê.

# Daxwaza kurdan a perwerdehiya bi zimanê dayikê

Daxwaza kurdan a perwerdeya bi zimanê xwe, daxwaza naskirina mafê kurdan a perwerdeya bi zimanê xwe ye. Ev daxwaz hem bi aliyên polîtîk û hem jî yên sosyolojîk xwedî avahiyeke tevlihev e



Arslan Ozdemir




*"Perwerdeya bi zimanê dayikê rêyeke girîng e ji bo parastina nasname û çanda neteweyekê yan jî komeke etnîkî û herwiha pêşxistina şiyana xwe ya derbirînê û fêrbûnê."*

Tercîha polîtîk bijarteyek e ku nêrîn û baweriyên kesane yên li ser mijarên polîtîk nîşan dide. Hilbijartinên polîtîk dikarin ji hêla gelek faktoran ve bêne bandor kirin, wekî bawerî, nirx, ezmûn û hawirdora civakî.

Tecrîhên polîtîk di teşekirina pêvajoyên polîtîk yên kes û civakan de roleke girîng dilîze. Vebijarkên polîtîk yên kesan bandorê li reftarên dengdanê, beşdariya polîtîk û piştgirîkirina rêberên polîtîk dike. Tecrîdên polîtîk yên civakan pergala polîtîk, polîtîk û nirxên welatekî diyar dikin.

Vebijarkên polîtîk dikarin bi awayên cûrbecûr bêne diyarkirin, wekî:

Mirov dikare tercîhên xwe yên polîtîk di hilbijartinan de bi dengdana partiyeke polîtîk yan jî namzetekî diyar bike.

Kesek dikare tercîhên polîtîk bi endambûna partî yan komên polîtîk, beşdarbûna xwenîşandanên polîtîk, an bexşandina kampanyayên polîtîk diyar bike.

Tecrîdên sosyolojîk di teşekirina pêvajoyên civakî yên kes û civakan de roleke girîng dilîze. Vebijarkên sosyolojîk ên kesan bandorê li şêwaza jiyanê, adetên vexwarinê, têkilî û tevgerên wan ên civakî dike. Tecrîdên sosyolojîk ên civakan çand, kevneşopî û nirxên civakê diyar dikin.

Vebijêrkên sosyolojîk dikarin bi awayên cûrbecûr bêne diyar kirin, wekî:

Mirov dikare tercîhên xwe yên sosyolojîk bi hilbijartina şêwaza jiyana xwe vebêje. Mînakî, mirov dikare jiyanek kevneşopî hilbijêre an jî jiyanek nûjen hilbijêrin.

Mirov dikare tercihên xwe yên sosyolojîk bi bijartina adetên xwe yên vexwarinê vebêje. Mînakî, mirovek dikare hilberên hawîrdorparêz bikar bîne an jî hilberên luks bixwe.

Mirov dikare tercîhên xwe yên sosyolojîk bi hilbijartina têkiliyên xwe yên civakî vebêje. Mînakî, kesek dikare bi malbat û hevalên xwe re têkiliyên nêzîk çêbike yan jî têkiliyên pîşeyî saz bike.

Mirov dikare tercîhên xwe yên sosyolojîk bi hilbijartina tevgerên xwe vebêje. Mînakî, kesek dibe ku tevgerek alîkar an tevgerek êrîşkar nîşan bide.

Daxwaza kurdan a perwerdeya bi zimanê xwe, daxwaza naskirina mafê kurdan a perwerdeya bi zimanê xwe ye. Ev daxwaz hem bi aliyên polîtîk û hem jî yên sosyolojîk xwedî avahiyeke tevlihev e.

Faktorên ku bingeha daxwazên kurdan ên perwerdeya bi zimanê xwe yê zikmakî pêk tînin ev in:

Kurdî zimanê zikmakî yê kurdan e û beşeke girîng a nasnameya kurdan e. Kurd ji bo parastin û zindîkirina zimanê xwe têdikoşin.

Kurdî li Tirkiyeyê ne zimanekî fermî ye û bi awayên curbecur rê li ber bikaranîna wî tê girtin. Ev rewş nîşaneya cihêkariya kurdan a di perwerde, kar û warên din de ye.

Gihîştina kurdan a perwerdehiyê li gorî herêmên din ên Tirkiyeyê kêmtir e. Perwerdeya bi zimanê zikmakî dikare bibe alîkar ku kurd bigihîjin perwerdehiyê û pêşkeftina wan a akademîk baştir bike.

Daxwaza kurdan a perwerdeya bi zimanê zikmakî ji bo çareseriya pirsgirêka kurd a li Tirkiyeyê gaveke girîng e. Qebûlkirina van daxwazan dê bibe sedema parastina nasname û çanda kurdan, têkoşîna li dijî asîmîlasyona çandî, pêşketina kurdan a civakî û aborî.

Ji aliyê siyasî ve daxwaza perwerdehiya bi zimanê zikmakî, daxwaza netewe yan jî komeke etnîkî ya parastina nasname û çanda xwe ye. Ev xwestek pir caran bi neteweperestî an jî hişmendiya nasnameya etnîkî ve girêdayî ye. Perwerdeya bi zimanê zikmakî bi hînkirina dîrok, çand û nirxên neteweyekê, di parastina nasnameya neteweyekê de dibe alîkar.

Ji aliyê sosyolojîk ve xwesteka perwerdehiya bi zimanê zikmakî, pêdiviya pêşxistina hêza xwe ya derbirînê û hînbûnê ye. Dema ku mirov bi zimanê xwe yê zikmakî perwerdehiyê werdigire, dikare pêvajoya hînbûnê hêsantir û bi bandortir biqedîne. Ev bandorek erênî li ser serkeftina akademîk û adaptasyona civakî ya kesek dike.

Wek mînak li Tirkiyeyê daxwaza perwerdeya bi zimanê kurdî wekî zimanê zikmakî ji ber sedemên polîtîk û sosyolojîk derketiye holê. Kurd bi perwerdeya bi zimanê xwe yê zikmakî dixwazin nasname û çanda xwe ya kurdî biparêzin. Her wiha tê fikirîn ku perwerdehiya bi zimanê zikmakî ya kurdî dê serkeftina akademîk û adaptasyona civakî ya zarokên kurd zêdetir bike.

Dildar Şaxî

# Reşbeleka romana Mehmet Dîcle

Nivîskar Mehmet Dîcle, piştî çapkirina çîrokên serkeftî, dest bi nivîsandina romanekê kiribû. Beriya demekê romana wî ya yekem a bi navê "Berfa Sor" ji weşanxaneya Zîzê der çû. Ev roman, wek tema, qala salên nodî dike. Ev tişt ji hin diyalogên romanê û ji mijara romanê ya sereke diyar dibe. Wekî mînak:

*"Filîtê MÎT kuştin! Wî bi dîregê ber quleteynê ve daleqandine"*

"Pere hebû di devê wî de" got Aram.

Her çi qasî nivîskar mekana romana xwe diyar nekiribe jî, li gorî erdnîgariyê em fehm dikin ku mekan derdora Geliyê Godernê ye. Jixwe di romanê de çend caran navê Geliyê Godernê jî derbas dibe.

Ev yek tenê ne ji erdnîgariyê an ji naverokê diyar dibe, her wiha ji zimanê devokî yê karakterên romanê jî diyar dibe. Wek Mînak di romanê de diyalogên wiha diborin:

"We wî rebenê zî nezewicand" (r.107)

"Ji ma rast bêje" (r. 87)

Ev mînakên li jor derdîxin holê ku herêm nêzî Geliyê Godernê ye.

Nivîskar di romanê de xwestiye ku vegotineke taybet ava bike, ev yek diyar e. Lê li ser navê "vegotina taybet", zimanekî wekî ku Ergîn Opengîn jî di tehlîla xwe de pênase dike, derxistiye holê. Ergîn Opengîn li ser romana "Otobûs" a Yunus Eroglu û hin deqên din ên edebî û rojnamevaniyê tesbîteke wiha dike:

"Di asta hevoksaziyê de bînyad û îmkanên zimanê tirkî gellek caran bi rengekî mekanîk ê kopîkirine dikevine nav darîştina hevok û rabêja berhemên kurdî. Heta ku xwînerên wan berheman tabi'e zimanê tirkî bin jî bo têgihiştina zimanê wan." (Tîr û Armanc, amadekar: Remezan Alan & Ergîn Opengîn (2014), Weşanxaneya Peywendê, r. 18)

Bi kurtasî, Ergîn Opengîn dibêje ku di hin berhemên kurdî de xwîner ku bi tirkî nizanibin, nikarin zimanê wan berheman fam bikin.

Ev tesbît di romana Mehmet Dîcle de jî gelek caran dubare dibe. Em li mînakên jêrîn binêrin.

"Her du polîsan yek caran ji hev re çav dikirin, bi zorê kenê xwe di bin simbelên xwe yên di qiraxê levên wan re heta çena wan dirêj dibûn de vedişartin." (r. 97)

"Aram şerm kir, di çaviyên dezgeh de li kevirê xwînê geriya, di nav şûşeyên vala yên kolonyayan, pakêtên jilêtan, sabûn û makîneyên poran ên xirabûyî, di nav mûçinikên zenga salan girtibûn de." (r.52)

Ev hevok divê bi çend hevokên ji hev cuda bê nivîsandin. Wexta ku em bala xwe didin pêşdaçek û paşdaçekan, em vê yekê bi rehetî dibînin; divê vegotin û teswîrên di navbera wan de ew qasî dirêj nebin da ku fehmkirinê zehmet nekin. Wekî ku ji mînaka jêrê jî eşkere ye, hevok di eslê xwe de ne bi kurdî ye.

"Tenê dengê nehlên qatirekî westiyayî ma di bêdengiya qehwexaneya ku hêdî hêdî tarî dibû de." (r.52)

"Sadece yorgun bir katırın nallarının sesi kaldı yavaş yavaş kararan kahvehanenin sessizliğinde."

Lê ev yek divê ji edîtorê pirtûkê Şexo Filîk yan jî ji weşanxaneya Zîzê bê pirsîn. Ji ber ku nivîskar mecbur nîn e ku bi rêzimaneke bêqisûr binivîsîne. Lê em wek xwîner zimanekî bêqisûr û îmlayeke rast dixwazin, ji ber ku em naxwazin ku ziman bibe asteng di navbera me û berhemê de.

Em li aliyên din ên romanê binêrin. Mehmet Dîcle di pirtûkên xwe yên çîrokê de welatekî xeyalî yê bi navê Asûsê ava dike. Ev welatê bi navê Asûsê di vê romanê de jî heye û bûyer li wir diqewimin.

Hevpeyvîna xwe ya bi 'Kurd Araştirmalari' re kirî, di wê de Mehmet Dîcle dibêje: "Welhasilê kelam, ji bo berhemdayînekê kamilbûn divê, dibe ku tu çend çîrokan bixwînî û kêfa te ji çîrokê re bê lê ev bi tena serê xwe têra nivîsandina çîrokê nake, an helbest û romanê jî. Divê em tu caran ji bîr nekin bi her berhemekê û cureyekê re em derdikevin ser dikeke ku beriya me hemî hunermendên dinyayê derketine wir." Ka em binêrin gelo "Berfa Sor" bi kijan karakteran derketiye ser vê dikê.

Karakterê romanê yê sereke Aram e û her wiha, kadro ji van kesan pêk tê : keça Aram Binevş, jina Aram Şerbet û hevalên Aram Saloyê Qatircî, Xeloyê Macir, Emînê Çavşûşe, Mehdiyê neviyê Aram û Asyaya bûka Aram. Ev kes wek karakterên cîhana kurdî xuya dikin di romanê de. Ji nav karakterên derveyî cîhana kurdî jî, polîs Alp wek yê herî berbiçav xuya dike. Dema ku me karakter hejmartin, me ew hemû li gorî têkiliyên wan ên bi Aram re pênase kirin. Ji ber ku di romanê de ji xeynî Aram em nikarin karakterekî xurt bibînin.

Nivîskar wê derfetê nade tu karakterên din; hemû bi awayekî ji rêzê têne vegotin. Em nikarin bi wan re bimeşin an jî bi wan re dinyayê bibînin. Karakter wek fîguranan xûya dikin, wek fîguranên ku ji kaxizan hatibin çêkirin. Em nikarin ji xeynî Aram tev li jiyana yekî din bibin. Her çi qasî ku Aram bi xwe bi awayekî serkeftî hatibe vegotin jî, ji ber ku kesên cîhana wî pêk tînin xuya nakin, Aram jî piştî demekê êdî winda dibe. Nivîskar behsa karakterekî dike û derbas dibe û bi pey re behsa yekî din dike û ji wî jî derbas dibe. Li kêm tiştan careke din vedigere. Ev yek jî romanê qels dike, kêm dike. Em li bendê ne ku karakterên din jî tevî mijarê bibin, lê wisa nabe û mijar tenê vediguhere vegotina çîrokekê. Mijar bi xwe nameşe ji ber ku karakter nameşin. Helbet ev jî aksiyona romanê dixitimînin û romanê dikin reşbelek. Ev roman reşbelekek e, ji ber ku karakter nehatine temamkirin.

Di romanê de gelek caran em rastî xewnên Aramî tên. Ev xewn aliyên serkeftî yên romanê ne. Dema ku behs ji xewnan tê kirin, xwîner nikarin zû bi zû ferqa di navbera rastî û xewnan de bibînin. Li wan welê tê ku qey Aram şiyar bûye, lê hîna nehatiye ser hişê xwe. Xwîner jî dikarin vê yekê baş bibînin.

Dîsa di romanê de hin hêmanên realîzma efsûnî hene. Wek nimûne, şûşeyên hêsiran hene ku di dikana Aram de tên firotin. Aram di romanê de xwediyê dikaneke sertiraşiyê (berber) ye. Di dikana wî de vîtrînek heye; ev vîtrîn di nava tozê de maye û ev şûşeyên hêsiran li vir tên parastin. Ber bi dawiya romanê ve, şûşe li navçeyê belav dibin; her roj zarokek tê dikanê û şûşeyeke hêsiran dikire. Di dawiya romanê de şer jî wek şûşeyan belav dibe û her ku şer belav dibe, êş jî belav dibe.




Her çi qasî ku nivîskar xwestibe welatekî efsûnî û xeyalî ava bike jî, ji xeynî vê yekê em rastî tu hêmanên xeyalîbûneke bi vî rengî nayên. Em dikarin bibêjin ku roman jixwe bi realîzma xwe ya xurt derdikeve pêş. Nivîskar laşên miriyên daliqandî, miriyên ku di avê de ne û gelek tiştên din bi realîzmeke hişk teswîr dike û di vê yekê de jî serkeftî ye. Bi kurtasî, em dikarin bibêjin ku Asûs têne wek nav xeyalî ye.

Di romanê de yek ji tiştên ku nivîskar dîtiye, lê nekariye xurt bike, aksiyona romanê ye. Wek mînak, di romanê de em rastî hespekê tên ku bêxwedî ye û li kolanên Asûsê baz dide. Dema ku di romanê de ev hesp xuya dike, êdî ev hesp wek paşxaneya bûyerên romanê derdikeve pêşiya me. Dema ku disekine yan jî baz dide, aksiyonekê ava dike. Lê nivîskar vê yekê jî wek mijara şûşeyan nîvî dihêle; çîroka van her du têgehan kûr nake, nahêle ku xwîner sembolên xurt li dest bixe. Bivê nevê, ev yek jî romanê dike halê reşbelekekê.

# Ewropî eleqeyek zêde didin fikrên Ocalan

Rojnameger Memet Drewş anî ziman ku eleqeya ji bo fikrên Rêber Apo û Tevgera Azadiya kurd zêde dibe û got: "Dr. Gulşah Kurt li ser tecrîdê nirxandineke balkêş kir û tecrîd wekî kuştina bêdeng bi nav kir."



| Yilmaz Yilmaz

Endamê Parlamentoya Ewropayê Massîmîlîano Smerîglîo, OHD, ELDH, AED û MAF-DAD, konferansa bi navê "Girtiyên siyasî: Tecrîd, kiryarên xerab û îşkence" pêk anî. Rojnameger Mehmed Drewş li ser armanca konferancê rawestiya û wiha got: "Armanca konferansê bal kişandina ser pergala îşkencê ya Îmraliyê bû. Teşhîrkirina pêkanînên kêfî yên li ser birêz Ocalan bû. Li ber çavan xistina xemsariya Konseya Ewropa û CPT'ê bû. Di heman demê de jî çalakiyeke di çarçoveya dûyemîn qonaxa "Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji doza kurd re çareseriya siyasî" de bû. Bi qasî ku xuya dike û ji peyamên rayedarên saziyên kurd ên Ewropayê fêm dibe, wê ji niha û pê ve, konferans û çalakiyên bi vî rengî zêde bibin. Bi konferansên bi vî rengî û çalakiyên cûr be cûr wê balê bikişînin ser pergala îşkencê ya Îmraliyê. Ji aliyê din hem fikr û felsefeya birêz Ocalan bidin nasîn û hem jî pêngava ji bo azadiya wî xurt û mezin bikin."

Rojnameger Memet Drewş li ser naveroka konferansê rawestiya û ev agahî dan: "Sernavê konferansê yê wekî "Girtiyên siyasî, tecrîd, mûameleyên xirab û îşkence" mijarên hatin axaftin radixe ber çavan. Ji Filîpînan, Spanya, Îtalya mêvan û mijarên balkêş hebûn. Wekî mînak Serokê Yekitiya Parêzeran a Navnetewî yê filîpînî Edre Olalîa qala rewşa şertên girtîgeh û girtiyên siyasî yên li Filîpînê kir. Tevî ku li ser darbeya li Filîpînan 40 sal borî û gelek hikûmet û serok guherîne, lê hê jî li zindanên Filîpînê 786 girtiyên siyasî hene. Dîsa rewşa girtiyên li Macaristanê, girtiyên siyasî yên ETA'yî yên li Baskê û girtiyên siyasî yên Katalan jî hate axaftin. Tişta fêm dibû, girtiyên siyasî li hemû welatan bi mûameleyên taybet re rû bi rû dimînin. Desthilatdar wekî dijmin nêz dibin. Ev herî zêde li welatên otorîter pêk tê. Lê welatên Ewropayê jî di warê tecrîd û zextên li dijî girtiyan de, ji welatên otorîter ne kêm in! Lê wekî giştî mijara herî zêde derket pêş rewşa Îmraliyê bû. Nêzîkatiya rêveberiya tirk a li dijî girtiyên siyasî bû. Nêzîkatiya taybet a dewleta tirk a li dijî Rêber Apo bû. Nêzîkatiya li dijî girtiyên siyasî yên Kurd bû."

**Mijar tecrîd bû**

Memet Drewş li ser mijarên ku derketin pêş jî rawestiya û got: "Ji welatên cûda axaftvan hebûn. Lê mijara hevpar tecrîd û pêkanînên desthilatdaran a li dijî girtiyên siyasî bû. Mijara herî zêde hate axaftin û ya hema bêje hemû axaftvanan îşaret pê kir jî, pergala êşkencê ya Îmraliyê bû. Gelek kesan di axaftina xwe de Îmralî wekî Guatamala ya Ewropayê bi nav kir. Hebûna girtîgeheke wekî Îmralî ya li welatekî endama Konseya Ewropa û welatekî ku Peymana Mafê Mirovan a Ewropayê îmze kiriye, ji tevahiya Ewropayê wekî şermek hate bi nav kir. Wekî mînak ji Akademîsyenên ji bo Aştiyê pispora hiqûqa cezayê û hiqûqa mafê mirovan Dr. Gulşah Kurt li ser tecrîdê nirxandineke balkêş kir. Dr. Gulşah Kurt tecrîd wekî kuştina bê deng bi nav kir. Dîsa gelek axaftvanan rewşa dijwar a Îmraliyê wekî îşkence û binpêkirinên bêmînak bi nav kirin. Gotin li ti deverê cîhanê tecrîda bênavber nîne. Cezayê heta hetayê li girtiyekî nayê birîn. "Mafê hêviyê" mafeke navnetewî ye. Di vê girtî bizanibe wê kengê ji girtîgehê derkeve. Lê Tirkiye vê bin pê dike. Tevî bi xwe peyman û prensîbên navnetewî îmze kiriye, pêwîstiyên wê bi cih nayne. Kesên axivîn ji vê yekê jî, Konseya Ewropa û Yekitiya Ewropa û saziyên pêwendîdar berpirsyar girtin. Hemûyan gotin eger Tirkiye tecrîdê pêk tîne, yek ji sedema bingehîn a vê xemsariya Konseya Ewropa û CPT'ê ye. Wekî mînak gelek kesan du rûtî ango cot standartiya Konseya Ewropa û CPT'ê destnîşan kirin. Bi taybetî jî hesasiyeta Konseya Ewropa û CPT'ê ya li dijî girtiyên siyasî yên li Rûsya bi bîr xistin û gotin heman hesasiyet ji bo birêz Ocalan û girtiyên siyasî yên kurd nîşan nadin. Sedema vê jî, têkiliyên wan ên bin Tirkiyeyê re ne."

**Ji sedî 70 biyanî bûn**

Memet Drewş diyar kir ku konferans û çalakiyên bi vî rengî, ji bo agahdarkirina saziyên pêwendîdar û raya giştî girîng in û wiha berdewam kir: "Eleqeya ji bo konferansê jî girîngiya wê radixist ber çavan. Wekî mînak bi salane li Parlamentoya Ewropayêkonferansan dişopînim. Lê ev yek ji yên herî qelebelix bû. Salon bi tamemî tijî bûbû. Ji sedî 60-70 kesên hatibûn guhdarî bikin, biyanî bû. Gelek hiqûqnas û siyasetmedar hebûn. Nunerên gelek dewletan hatibûn. Ji welatên Yekitiya Ewropayê heta nunerên konsey û komîsyonê bi riya kesên cûda konferans şopand. Gelek nivîskar, rojnamevan û akademîsyenan şopand. Lewma mirov dikare bibêje yek ji konferansên girîng ên demên dawî bû. Wê ev bandor li pêvajoya ji niha û pê ve bike. Bi taybetî jî bandoreke mezin li belavbûna fikrên Ocalan û pêngava ji bo azadiya wî bike."

**'Dixwazin Rêber Apo nas bikin'**

Drewş bal kişand ser nêzîkatiya kesên biyanî û dostên Kurdan û wiha lê zêde kir: "Hunek cûda rewşê dinêrin. Ji ber ku ew tevgera azadiya kurd nas dikin. Fikrên Rêber Apo dizanin. Hebûna Rêber Apo ya li Îmraliyê, wekî berxwedana 25 salî dinirxînin. Sedema tecrîdê jî, wekî tola li dijî ked û têkoşîna Rêber Apo dibînin. Lê yên li derveyê dostan, hinek kesên xwedî wîjdan û demokrat in. Bi taybetî piştî têkoşîna Kurdan ya li dijî çeteyên DAIŞ'ê hewl didin, kurdan û Rêber Apo nas bikin. Ji Afrîkaya Başûr heta Spanya, Fransa û Belçîka gelek biyaniyên nas dikim, têkoşîna şagirtên Rêber Apo ya li dijî DAIŞ'ê bi heyranî tînin ziman. Gelek ji wan dibêjin; 'bi saya têkoşîna şopdarên Ocalan, cîhana me îro bi ewle bûye'. Hin ji wan pêvajoya dema êrîşên çeteyên DAIŞ'ê yên li Bruksel û Parîsê bi bîr dixin. Rêz, hurmet û heyraniya xwe ya ji bo têkoşerên kurd tînin ziman. Lê nikarin zêde bandor li siyaseta dewletên xwe bike. Berjewendiyên siyasî û aborî dikevin pêşiya prensîban."

Drewş destnîşan kir ku hiqûqnasan ev konferans organîze dikir û wiha axivî: "Lewma piraniya beşdaran hiqûqnas bûn. Yên axivîn hemû parêzer û hiqûqnasên di warê hiqûqa ceza, hiqûqa şer û hiqûqa navnetewî de kesên pispor bûn. Kesên li welatên xwe tên nasîn in. Helbet bandora wan li ser dîplomasiya Ewropayê dibe. Lê encamên wê di demên pêş de mirov dibîne. Konferanseke hêja û dewlemend bû. Min jê gelek sûd wergirt. Bi vê konferansê careke din min dît, di demên dawî de eleqeya ji bo fikrên Rêber Apo û Tevgera Azadiya Kurd zêde dibe. Tevî hemû zextên Tirkiyeyê û derfetên mezin ên ji bo dîplomasiyê veqetandine, tijîkirina saloneke Parlamentoya Ewropayê serkeftina dîplomasiya kurd radixe ber çavan. Eleqeya ji bo fikrên Abdullah Ocalan nîşan dide. Nîşan dide ku dostên kurdan zêde dibin. Êdî zextên Tirkiye û bi sedan milyon dolarên ji bo dîplomasiya li dijî kurdan kêr nayên."



Xweşkanî

Felemez Ulug

# Tecrîd îşkence ye

Ev zêdetirî 3 sal in tu agahî ji Rêber Apo nayê girtin. Rejîma faşîst a AKP/MHP'ê ku ku tifaqa xwe li ser qirkirina gelê kurd û Tevgera Azadiyê daye avakirin hewl dide bi vê pergala tecrîda li Îmraliyê îradeya gelê kurd bişkîne û teslîm bigire. Li dijî van hewldanan ne tenê li bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê li çar aliyên Kurdistanê û cîhanê gelê kurd û dostên wan di nava têkoşîne girîng û bi wate de ne. Pêngava "Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka kurd re çareserî" ku bi beşdariya gelek rewşenbîr, siyasetvan, zanyar, hunermend û lêkolîneran di 10'ê Cotmaha 2023'yan de bi awayekî hemwext li gelek navendên cîhanê hat ragihandin yek ji van xebatan e.

Di çarçoveya pêngavê de gelê kurd û dostên wan li dijî pergala tecrîda ku hemû pîvanên hiqûqî yên navneteweyî binpê kiriye li navendên cûda xebat tên meşandin. Bi van xebatan tê xwestin ku li hemberî faşîzma AKP/MHP'ê êdî bi her awayî ji nirxên mirovahiyê dûr ketiye û li dijî gelê kurd veguheriye pergala şer û qirkirinê tedbîr bên stendin.

Bi vê boneyê bi beşdariya gelek hiqûqnas, siyasetvan û rewşenbîran di 11'ê Nîsanê de li paytexta Belçîka Brukselê bi pêşengiya Hiqûqzanên ji bo Mafê Mirovan û Demokrasiyê yên Ewropayê li avahiya Parlamentoya Ewropayê konferansek li dar xistin. Di konferansa bi sernavê "Tecrîd, kirinên xirab û îşkenceya li zindanan" hat li darxistin de hiqûqzanên demokrat ên Ewropayê û Komeleya Hiqûq û Demokrasiyê ya Navneteweyî pergala tecrîda li Îmraliyê û bêhiqûqiya li ser Rêber Apo tê ferzkirin bi awayekî berfireh nirxandin.

Di konferansê de hat diyarkirin ku ji ber bêdengiya qada navneteweyî li girtîgehên dewleta tirk, bûyerên îşkence û muameleya xerab li girtîgehan her ku diçe zêdetir dibin. Bi hincetên kêfî û derqanûnî înfazên girtiyan tên şewitandin, cezayê hucreyê didin wan û ew ji mafên xwe yên herî bingehîn tên dûrxistin. Sedama van kiryaran jî bi pargala tecrîdê ve hat girêdan û çavdêr diyar dikin ku tecrîd veguheriye rejîma darvekirinê.


Divê bê zanîn ku Tirkiye li seranserî cîhanê yek ji welatên herî zêde girtiyên siyasî lê tên girtin e. Ev ji gelek aliyan ve tabloyeke tirsnaktir bi xwe re derdixe holê. Bi rejîma faşîst û qirker a AKP/MHP'ê re hiqûqê veguheriye amûra bingehîn a zexta siyasî. Tevî ku di meşandina vê pergalê de dewleta tirk hemû peyman û pîvanên navneteweyî binpê dike jî li hemberî wê bêdengiyek heye. Ev bêngiya sazî û rêxistinên hiqûqî yên navneteweyî di konferansê de hat rexnekirin. Beşdarên konferansê li hemberî vê rewşa xirab ya ku roj bi roj hiqûqe diqedîne banga hişyariyê kirin.

Dewleta tirk a qirker di şexsê tecrîda li Îmraliyê de gelê kurd dike hedef. Ev tecrîd qasî ku derhiqûqiyê, her ewqas jî siyasî û piralî ye. Têkoşîna li dijî tecrîdê ku divê bi awayekî sîstematîk bê meşandin, yek ji dînamîkên herî girîng ên têkoşîna aştî û demokrasiyê ye. Gelê kurd û dostên wan ji roja ewil de di vê rêbazê de israr kirin û xwestin li himberî vê pergala qirker vijdanê raya giştî têxin hereketê. Lê ji ber ku nêzîkatiya li hemberî gelê kurd siyasî tê dîtin di qada navneteweyî de weke tê xwestin li dijî vê tecrîda neqanûnî jî helwestek pêş nakeve. Lewma dema ji vî aliyî ve jî em dinirxînin konferansa ku pêk hatî ji gelek milan ve girîng bû.

Pêkhateyên konferansê li gorî encamên û rewşa xirab a li Ewropayê biryar dan ku li dijî tecrîd û îşkenceya li girtîgehan têkoşîneke bi bandor, yasayî û siyasî ya kolektîf bê meşandin. Ji bo vê jî bang li mekanîzmayên Yekitiya Ewropa û Konseya Ewropayê kirin ku ji bo dawî li pêkanînên dijmirovahiyê yên li Îmraliyê û girtîgehên din ên Tirkiyeyê bên divê helwesteke çalaktir û gavên berbiçav bavêjin. Lê divê pêkhateya konferansê şopdarên vê pêvajoyê be. Ji ber ku hemû beşdarên konferansê kesayetên xwedî nasname û girîng bûn dikarin di vê mijarê de bibin xwedî rol. Ger di qada pratîk de bi erk û berpirsyarî tevbigerin dikarin bandorê çêkin.

Di konferansê de yek mijarên ku bi berfirahî hat destgirtin û nirxandin jî helwest û nêzîkatiya Komîteya Pêşîgirtina li Îşkenceyê ya Ewropayê (CPT) bû. Beşdaran anî ziman ku tevî gelek caran bang li CTP'ê hatiye kirin jî ew bi berpirsyariyên xwe ranebûye. CPT a ku qaşo erk û berpirsyariya wê ewe pêşî li îşkenceyê bigire, ji ber vê xemsarî û bêhelwestiya xwe bûye yek ji saziyên herî girîng ên îşkenceya psîkolojîk. Saziyên ku di nava tevna pergala kapîtalîst de hatine avakirin li gorî berjewendiyên vê pergalê tev digerin. Lewma CPT jî mîna gelek saziyan di mijara doza Rêber Apo de aliyê pargalê digire û nikare derveyî vê pergala zordest tu biryaran bigire. Ji ber vê yekê her çendî bang CPT tê kirin jî ew xwe ker û lal dike.

Konferansa ku di çarçovaya qonaxa duyem a pêngava "Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka kurd re çareserî" hatî lidarxistin de bi mijarên ku hatin nirxandin astek girîng girt. Ya girîng ew e ku di konferansê de cara ewil di warê yasayî û qanûnî de pergala tecrîda li Îmraliyê ji aliyê hiqûqnasan ve hat destgirtin û nirxandin. Weke beşdarên konferansê jî anîn ziman careke din aşkere bû ku tecrîda li Îmraliyê bi her awayî derqanûnî ye û li dijî mafên mirovan e.



Hesen Huseyîn Denîz

# Du mijarên girîng

Di rojevê de du mijarên girîng ên tirk û bi taybetî kemalîst pê har bûne û diteqin lê ji dest wan êdî tiştekî karibin bikin nayê, ji ber ku nemaye, hene:

Ji van yek jê aşkerebûna derewa wan a sed salan e, ku li ser televizyonan û di rojnameyan de her dem ji bo kurdan propagandaya “Cografya kaderdir” Erdnîgarî qeder e, dikirin. Çi ji aliyê çepê tirkan ve, çi ji aliyê kurdên nezan û îslamî ve, dem bi dem li ser medyaya kurdî û ya muxalîf jî ev gotin tê kirin. Wateya gotina “Cografya kaderdir”, ev e: Kurdino, hûn li ser erdnîgariyeke wisa jidayik dibin û dijîn, ku çi bi serê we ve were ew qedera we ye. Ew ji berê ve hatiye xêzkirin. Hûn bixwazin jî nikarin biguherin. Ev bindestiya we û serdestiya tirk, ereb û farisan qedera we ye. Qebûl bikin û deng mekin. Feqîriya we qedera we ye. Bênasnamebûna we qedera we ye. Qedexeya li ser ziman û hebûna we qedera we ye. Ji ber ku hûn li ser erdnîgariyeke bindest tên ser ruyê dinyayê. Ji bo wê dengê xwe mekin û li ber xwe nedin.

Heman gotin bi riya îslama bi dare zorê bi kurdan hatiye pejirandin jî tê gotin: Berî hûn ji dayik bibin, her tişt li ser eniya we hatiye nivîsandin û hûn nikarin biguherin. Yanî kurdek mecbûr e, wek bindest, bênasname û bêziman were ser ruyê dinyayê. Îslam dibêje: Tewekul bikin. Her tiştî bispêrin xwedê û bi qedera xwe razî bin. Yanî bindestî para we ye, dengê xwe mekin.

Gava em li vê gotinê dinêrin îslamiyeta para kurdan ketiye û desthilatdariya li ser kurdan di heman fikir, bîrdozî û nêrînê de ne. Wê demê ev her dû jî ji bo kurdan şaş in û ne riya rast in.

Erdnîgarî ne qeder e. Qedera mirovan ji berî jidayikbûnê ve nayê xêzkirin. Mirov qedera xwe bi destê xwe tayîn dike. Bindestî, koletî, bênasnamebûn û bêzimanbûn ne qeder e, berûvajî mînakên bi sedan miletên bi riya têkoşînê xwe ji vê rewşê derxistine hene. Ji bo wê bila ti kes dernekeve ser medyayê û ji kurdan re telkîna “cografya kaderdir” neke. Kurdan ev qeder berî çil salan çirandine û ji wê demê ve qedera xwe ya nû bi destê xwe dinivîsin û wê hîn jî xweştir binivîsin. Raperîna serê Nîsanê li Wanê û li gelemperiya Kurdistanê rû da û encam girt, tenê nîşaneyek ji vê ye. Kurd wê qedera welatê xwe jî bi destê xwe tayîn bikin, ne çepê tirkan, ne dewletên serdest, ne jî kurdên nezan, ne jî şêx û meleyên xwefiroş wê nikaribin rewşa bindestiyê bi kurdan wek qeder bidin pejirandin. Kurd wê azad bibin.




Bila ti kes dernekeve ser medyayê û ji kurdan re telkîna; “cografya kaderdir” neke. Kurdan ev qeder berî çil salan çirandine û ji wê demê ve qedera xwe ya nû bi destê xwe dinivîsin û wê hîn jî xweştir binivîsin

Mijara duyemîn fîlmekî wek rêzefîlm di Netflixê de tê temaşekirin e. Di wî fîlmî de cîhan bi xetareya tinebûnê re rû bi rû dimîne û netewên Yekbûyî li riyeke cîhanê rizgar bike, digere. Cîhan bi her awayî ketiye bin çavdêriya hêzeke desthilat ku çavên wê hêzê li ser giştiya mirovan e. Jina berpirsyar a li Netewên Yekbûyî, dibêje, “Ew dikarin her liv û tevgera me kontrol bikin, lê çi di hişê me de ye, wê nikaribin. Ji bo wê emê sê mirovên xurt hilbijêrin û wê ewê ew tişta di hişê me de biparêzin. Yek ji van kesek amerîkî, yek kesek Çînî û yek jî jineke Kurd a di şerê Reqayê de li hember teroristên DAIŞ’ê serkeftinên mezin bi dest xistiye ye. Jina berpirsyara Netewên yekbûyî navê her sê kesan yek bi yek dibêje û di rêza duyem de Leyla Ariç derdikeve ser dike, kincên leşkerî lê ne. Jina berpirsyar wê wek leheng dide nasandin. Ev rêzefîlm hîn didome, di beşê 8’an de, ji xuleka 13’an destpê dike. Û di xuleka 14.05 de Leyla Ariç tê danasîn. Di rojên pêş de gerîlaya kurd Leyla wê çi bike, emê bi hev re lê temaşe bikin. Navê rêzefîlmê “3 Boden Problem” e.

Ji ber jineke Kurd wek lehenga rizgarkera cîhanê di fîlmekî de tê nasandin, tirk, kemalîst, nijadperest, hûr û girsên wan tev har bûne, nema dizanin çi bikin. Lê ji xwe Kurdan di şerê li hember teroristên DAIŞ’ê de mirovahî ji xetereya mirinê rizgar kirin. Bi hezaran ciwanên kurd-keç û kur- jiyana xwe di oxira mirovahiyê de dan û xetareya vê terorê ji ser cîhanê rakirin. Ji bo wê pir asayî ye, ku di fîlmekî de ev lehengiya kurdan were nîşandan û di rizgarkirina cîhanê de roleke girîng bigirin ser xwe.

Di vir de tişta kurd ji xwe re wek dersekê jê bigirin ev e: Cîhan bi çavekî mezin li kurdan dinêre. Kurd li ber çavê cîhanê leheng in û ev rastiya kurdan a bi sedsalan e hatiye înkarkirin û veşartin e. Mixabin piraniya kurdan jî ketine ser vê riyê û ji kurdbûna xwe şerm dikin û ji bo wê dest bi tirkbûn, erebbûn û farsibûnê kirine. Ev yek şaş e. Divê kurd bi kurdbûna xwe serbilind bin. Kurd leheng in, mirovhez in, xwezaparêz in û mazlûm in. Ew koledariyê, zilmê, kuştinê nakin, ji bo aramiya cîhanê canê xwe bi lehengî didin. Ev serbilindiya kurdan e. Çawa ku cîhan bi kurdan serbilind e, divê kurd jî bi kurdbûna xwe serbilind bin û li hebûna xwe, nasnameya xwe, zimanê xwe û azadiya xwe xwedî derkevin.

Dîsa derseke kurd ji bo xwe bigirin ev e ku di fîlmekî de jî be, tirk diyaxa hebûna kurdan nakin. Ew qebûl nakin ku hebûn û lehengiya kurdan di fîlmekî de jî were nîşandan. Ewqasî înkarker, xwînxwar, dijmin û niyetxirab in. Ji bo wê, divê kurd dost û dijminê xwe baş nas bikin, nebêjin “Me dijmin nas nedikir”. Em dijminê xwe baş nas dikin, ew hebûna me di fîlmekî de jî qebûl nake, tevî ku giştiya cîhanê qebûl dike û ji kurdan re rêz digire, kurdan wek lehengê rizgarkerê cîhanê diyar dike.

Gelek nirxandinên din ên mirov li ser vê mijarê bike hene. Lê ka em li fîlmê “3 Body Problem” temaşe bikin û asta harbûna neyaran bibînin.

M.Torî

# Şerê bi şerê taybet re

Ji bo şerê bi şerê taybet re, beriya her tiştî yekîtiya rêxistinî pêwîst e. Mirovê Zana gava dibêje, “Li Kurdistanê pelê darê bi xwe jî bê rêxistinbûyîn nikare biheje”, a rast amaje bi geşedanên germegerm ên niha diqewimin jî dike. Serketina li hember polîtîkayên “dabeş bike, parçe bike, bi rê ve bibe û berî hev bide” ya îngîlîzan ku em di seranserê dîrokê de rastî wê tên, bi ferdê rêxistinkirî û civaka rêxistinkirî pêkan e. Ji lew re rastî yekpare ye û parçekirina rastiyê, parçekirina mirov e ku ew bi awayekî mîkroyî gerdûn bi xwe ye.

Wekî gelek caran hatiye gotin, pergala TC’ê bi temamî pergaleke şerê taybet e. Bi awayekî dîrokî rehên vê pergalê, xwe disipêrin demeke dûr û dirêj. Şervaniya taybet ku ji aliyê rêbazê ve jî gelek rêyan bi awayekî hemwext bi kar tîne, awayê şerê topyekûn e ku li dijî civakê tê kirin û pêşxistin. Awayê herî xeternak yê vê konsepta şerê taybet ku pêngavên pir xasûk û kujende di xwe de dihewîne, bi rêya hunermend, akademîsyen û “rûspî” û siyasetmedaran pêk tê. Derfetên mezin dide ber van kesan û wan bi veberhênaniyeke mezin diafirîne. Û axirê bi destê wan, operasyonê têgihaniyê dimeşîne li ser girseyan. Konsepta şerê taybet, çendî qirkirina fizîkî ya civakan ji xwe re kiriye hedef, esas bigire jî, lê armanca wê ya sereke nirxên exlaqî, hest û hizira civakan e. Di vî warî de bi awayekî birêkûpêk berê xwe dide nirxên exlaqî û bi taybetî jî nirx û bêgunehiya zarokatiyê. Bi dû re wan qir dike, diguherîne û li şûna wan a herî çêkirî datîne. Lewma rêketina bi mirovên ku daxilî pêvajoyeke têgihiştinê û dahûrandinê nebûne, hewldaneke bêhûde ye. Ji bo naskirina mirov û xwenaskirinê, dahûrandinên kesayetiyê pir girîng in. Ger pirtûka mezin mirov be, nexwe wê felsefeya “tu li çi bigerî, pêşî di xwe de lê bigere” wê me ber bi rastiyê ve bibe. Madem xwenasîn dayika hemû zanistan e, nexwe destpêkirina bi zanebûnê divê pîvana sereke be.

Ger di destê te de rastiyên te hebin, serkeftin bivênevê ye. Raza têkoşîna hebûniyê ya gelê kurd a li hemberî hemû êrişên qirkirinê ku ji bo cîhanê bûye emsal, ev bi xwe ye. Rastiya Rêbertiyê ya ku bi rastiyekê bi rê dikeve û amûrên azadiyê li ser van rastiyan diafirîne, dînamîka sereke ya pûçkirina pergala şerê taybet e. Di vê çarçoveyê de bi awayekî rast xwendina sosyolojiya azadiyê û di vê çarçoveyê de nêzîkatiya li bûyer û diyardeyan û dawerivandina wan a bi etîk û estetîkê, tiştekî jiyanî ye. Her tişt mîna hingiv bi awayekî ewqasî sade û parzinandî berpêşî me hatiye kirin. Lewma ji bo vegera li hebûnî û xwebûniya xwe ya herî biqîmet û ji bo afirandina şoreşên xwe, divê ewilî mirov bi têkoşîna mezin a li hemberî nefsê ya bi navê “cîhadî ekber”ê dest pê bike. Li cihê ku rexne û xwerexnekirin pêş neketî, ne pêkan e ku mirov di şerê nefsê de bi ser bikeve. Kesên ku rexneyê nekin û xwe di xwerexnekirinê de danewerivînin, hem wê xwe hem jî yên kêleka xwe stewr bikin û her biçe wê bi awayekî mental xwe û wan biçûçik bike.

Di vî warî de, pêwîst e mirov gotina “jiyana şaş rast nayê jiyîn” a Adorno careke din rast şîrove bike. Em hemû baş dizanin ku li erdnîgariyeke ku bi qirkirina hişî re rû bi rû ye, ji bo pêkanîna bîrê têkoşîneke tekûz divê. Lê tevî vê yekê jî, li hemberî êrişên bombardumanî nepêşxistina xweparastineke berfireh, tê wateya zengarkirina kilîda zincîrên koletiyê. Ji lew re, kilîd her ku zengarî bibin, vekirina wan jî ew qasî zehmet dibe. Qereqolên ku şerê taybet di mejiyê mirovan de ava kirine û zincîrên ku xistine stûyê me, ancax bi şerekî bîrdozî yê xurt û kûr dikarin bên şikandin. Spartakus gava digot “ji xeynî windakirina zincîrên xwe tiştekî ku em winda bikin tune ye”, ji bo azadiyê serî li ber tiştî rakiribû. Liv û tevgera di warê têkoşînê de, kulma herî xurt a li koletiyê ye. Lewma ji bo em karibin li dijî şerê taybet şer bikin, beriya her tiştî divê em bi şer zanibin û xwe li gor vî şerî perwerde bikin. Li ser esasekî ne rast xwepwerdekirin, tê wateya hetahetayê ketina ber çerxa polîtîkayên şerê taybet.

Mîrateya herî hêja û biqîmet a gel û civakan çand, huner û wêjeya wan e. Şerê taybet di serî de êrîşî vê manewiyatê dike û hewl dide wê tune bike. Hema bibêje li tu derê cîhanê gelên ku ji bo zimanê xwe têdikoşin tune ne. Lê li Kurdistanê şerê ji bo vê û rûbirûbûna bi pêkanînên hovane mînakên aşkere yên vê yekê ne. Feraseteke ewqasî paşverû û faşîst heye ku tenê li ser qirkirin û înkarkirinê hûr bûye. Lewma ji bo em karibin xweparastina xwe ava bikin, ji xeynî parastina ziman, çand, huner û wêjeya xwe tu rêyeke me ya dinê tune ye. Ji bo parastina xwe û çanda xwe jî, divê beriya her tiştî em şervanên ferasetê û kesên ji bo azadiyê canê xwe feda kirine ku manewiyata me ya herî xurt in, ji xwe re bikin rêber û li ser azadî û serketinê hûr bibin. Tenê wê çaxê şerê me yê li dijî şerê taybet wê karibe bi ser bikeve û me bigihîne armanca me. Yan na, wê nirxên me yên exlaqî û manewiyata me ji aliyê mêtingeran ve bên tayinkirin û em ê mehkûmî hebûniyeke bêwate bibin. Li cihê ku ciwan, jin, bawerî û çand lê rêxistinkirî, jiyaneke watedar û azad heye.

Li Kurdistanê ev sed sal in, bi taybetî jî di 50 salên dawî de, ji bo şikandina pergala şerê taybet a TC’ê, têkoşîneke dîrokî tê meşandin. Pêşengên vî gelî û pêşengên têkoşînê, bi hin rêbazên qirkirinê gelek caran rastî êrişên qirkirinê hatin. Wekî tê zanîn êrişa herî berfireh ku armanca wê ne tenê Kurdistan, şikildayîna li dîroka Rojhilata Navîn û cîhanê bû, komploya 15’ê Sibata 1999’an a li dijî Rêberê Gelan bû. Bîst û pênc sal in dixwazin vê komployê bidin jibîrkirin û veguherînin tiştekî asayî û rastiya kurdan bê pêşeng bihêlin. Lê îro ro ligel hemû hewldanên pergala dewletparêz, meşa azadiyê ya li Kurdistanê piraniya vê pergala şerê taybet pûç kiriye û rastiya gelekî û têkoşînekê ku dibêje ‘em jiyana bi komployê qebûl nakin’ derxistiye holê.

Dema Mazlûm Dogan di sala 1982’yan de li zindana Amedê got, “Teslîmiyet dibe îxanetê, berxwedan dibe serketinê”, wî siberojê didît. Dema meşvanên azadiyê ku ji heftê û pênc kesan pêk dihatin û ji du milan ve li Kurdistanê geriyan, di 13’ê sibatê de gihaştin Amedê, li ser zimanê wan dirûşma “Berxwedan jiyan e” hebû. Ew şerê taybet ê li zindana Amedê ku li hemberî mehkûmên azadiyê pergala îşkence û zilmê pêş xistibû, li hemberî xeta berxwedêr a ku bi dirûşma “Berxwedan jiyan e” bi ruh û can bûbû, têkçû û şikiyabû. Lewma, em îro careke din fêm dikin ku em dikarin bi ruhê Mazlûman li dijî şerê taybet bi ser bikevin. Rastiya gal a berxwedêr ku li çiyê, li bajaran û li zindanan bi berxwedanê bedew dibe, mizgîniya serkeftinê ye ji bo me.





Prof. Dr.
Abdulîllah Polat

# Berxwedan û zordarî



> Di vê rewşê de, tirs çixa bilindtir dibe, daxwaza protestoyê jî mezintir dibe. Ev israr û îradeya ku li hemberî zilmê tê nîşandan, ji bo têkoşîna edalet û guhertina siyasî jiyanî ye

Her yek ji me xwedî tercîhên siyasî ne. Dema ku hin kes muhafezekar in, ên din helwestek lîberaltir tercîh dikin. Ev tesnîfkirin û helwestên siyasî ji aliyê faktorên cihêreng ve tên çêkirin. Hin ji van pêşgotinên genetîkî, bersivên hestiyarî yên li ser bûyerên siyasî, pêvajoyên civakîbûnê û mekanîzmayên cognitive (zanistî) hene. Di vê çarçoveyê de, her wiha balkêş e ku mirov temaşe bike ka di nav civakên zordar de jî mirov carinan amade ne ku rîskan bişopînin da ku çalakiya siyasî bimeşînin. Serhildana li bajarê Wanê û bajarên din ên ji bo vê yekê mînakek e û divê serhildan û hevgirtina kurdan di çarçoveyeke derûnî de pir baş were fêmkirin. Bi rastî, psîkolojiya siyasî hewl dide ku vê diyardeyê çareser bike û motîvasyona li pişt çalakiya siyasî fêm bike. Ji bo bêtir ronîkirina vê xalê, têgînên çalakiya kolektîf; ji bo ravekirina çalakiyên ku ji hêla komek di çarçoveyek siyasî de têne meşandin têne bikaranîn.

Ev dikarin çalakiyên kolektîf ên normatîf bin ku di çarçoveya norm û zagonên civakî de pêk tên, an jî kiryarên ne normatîf ên ku têkbirina wan norm û qanûnan pêk tînin û dikarin hem aştiyane û hem jî tundûtûj bin. Hewldana aktîvîzma siyasî bi taybetî di civakên tepeserker ên mîna otokrasî yan rejîmên dîktator de balkêş e. Mirov meraq dike ku çi motîvasyona mirovan dike ku tevî metirsiyên mezin ên girtinê yan jî heta mirinê jî beşdarî çalakiyê bibin. Rêyek mimkun e ku bersiva vê pirsê bide, bi navê hîpoteza moralkirinê ye. Ev teorî texmîn dike ku mirov hewl didin ku kiryarên ne-normative û heta tundûtûjiyê 'exlaqî' bikin da ku wan ji xwe re rewa bikin. Weke mînak ger sîstemeke otorîter weke neheqî bê binavkirin, dibe ku kiryarên radîkal ji aliyê exlaqî ve rast û pêwîst bên nirxandin. Hîpoteza duyemîn teoriya; tiştekî winda nabe; ye. Ev behsa rewşên ku xwepêşander an çalakvanan ji bo guhertinê bi rêya protestoyên kevneşopî kêm dibînin. Di rewşên wiha de, ew dikarin biryar bidin ku nêzîkatiyek ne-standard bavêjin ji ber ku ew hîs dikin ku tiştek nemaye ku winda bikin. Hîpoteza; hilbijartina stratejîk; beşdarbûna çalakiyên protestoyî yên ne-normative wekî tevgerek taktîkî rave dike ku balê bikişîne, hevgirtinê teşwîq bike, an jî kesên din razî bike ku beşdarî berxwedanê bibin. Lê tiştek aşkere ye: ev mijar tevlihev û piralî ne û her çalakvanek çîrokek taybetî û sedemên takekesî yên tevlîbûna xwe hene. Ev yek bi taybetî di çarçoveya komên nifûsa bindest ên weke kurdan de tê dîtin. Tevî rîsk û berxwedanên ku pir caran rû bi rû dimînin jî, gelek ji bo maf û nirxên xwe yên siyasî bi lehengî têkoşînê dimeşînin. Tecrûbeyên çewisandinê û têgihîştina rîskê di îradeya gel a ji bo tevlîbûna çalakiyên berxwedanê de roleke girîng dilîze.

**Serhildana li dijî tirsê**

Di vê rewşê de, tirs çixa bilindtir dibe, daxwaza protestoyê jî mezintir dibe. Ev israr û îradeya ku li hemberî zilmê tê nîşandan, ji bo têkoşîna edalet û guhertina siyasî jiyanî ye. Bi kurtasî: hewldana beşdariya siyasî, nemaze di çarçoveyek zordar de, diyardeyek tevlihev û pirreng e. Dibe ku gelek metirsî hebin, lê baweriya bi guhertina siyasî û daxwaza edaletê pir caran bihêztir e. Hin kiryarên xwe bi hincetên exlaqî rewa dikin, hin kiryarên radîkal wekî tekane îmkana guherînê dibînin û hin jî wan wekî amûrek stratejîk bikar tînin da ku balê bikşînin û yên din teşwîq bikin ku tevbigerin. Têkoşîna ji bo mafên siyasî û sîstemek dadperwer, cesaret û îradeyek mezin dixwaze, bi taybetî di rejîmên zordar de. Tevî ku çalakiya siyasî di şert û mercên zordar de metirsiyên girîng hildigire jî, biryardariya gelek kesan ji bo berdewamkirina baweriya xwe ya bi dadwerî û guhertinê re hêz û berxwedana ruhê mirovî nîşan dide.

Bi taybetî jî di çarçoveya kurdan de diyar dibe ku tevî xeterî û zextên li pêşiya me jî îradeya guhertinê çiqasî xurt e. Aşkere dike ku xwesteka azadî û edaletê tevgereke mirovî ya bingehîn e ku bi hêsanî nayê têkbirin. Kurd tevî rewşa xwe ya pir metirsîdar, bi biryar in ku mafên xwe biparêzin û balê bikşînin ser neheqiyên civakî. Bi naskirina wê yekê ku daxwaza aştî, dadmendî û azadiyê gerdûnî ye, divê em cesaret û berxwedaniya wan kesên ku li hember kêşeyên mezin di bin rejîmên zordar de berxwe didin nas bikin. Çîrok û serpêhatiyên wan ne tenê ji berjewendiya akademîk in, lê di heman demê de îlhamek in ji bo hemû kesên ku bi cîhanek adiltir û azadtir bawer dikin. Di dawiyê de, têgihîştina motîvasyon û dînamîkên aktîvîzma siyasî, bi taybetî di çarçoveya tepeserkirina siyasî de, alîkariya me dike ku em kiryarên van mirovên wêrek baştir fêm bikin û binirxînin.

**Berxwedana komkirî**

Berxwedana van komên bindest bi taybetî jî gelê kurd girîngiya perwerde û hevgirtinê radixe ber çavan. Her çalakî, çi mezin û çi biçûk be, ji bo civakek adil û azad pêngavek e. Ne tenê ji bo pêkanîna armancên siyasî, di heman demê de bi rastî, dilovanî û baweriya bi rûmeta her mirovî ye. Hêz û îradeya van çalakvanan tîne bîra me ku cesareta rawestana li hember neheqiyê û afirandina guhertinê di nava her yek ji me de ye. Bi kurtî, aktîvîzma siyasî di civakên zordar de nîşan dide ku tevî metirsiyên mezin, ji bo bidestxistina guhertinên civakî berxwedan mumkin û pêwîst e. Kurd mînakên zindî ne ku baweriya bi edalet, azadî û wekheviyê çawa dikare ji her astengî derbas bibe û ajotina guherînê hînî me dike ku qîmetê bidin hêza çalakiya kolektîf. Çi bi xwepêşandanan, çi bi rêxistinkirina siyasî û çi jî bi berxwedaneke rasterast, hewldanên wan ên bêwestan bi bîr tînin ku tevî metirsî û zordariyê jî, daxwaza edalet û azadiyê mumkin e û berî her tiştî pêwîst e. Her tevgerek siyasî bi dengên kesane dest pê dike ku bilind dibin û li hev kom dibin da ku guhertinek kolektîf çêbikin. Ji ber vê yekê em ji kurd û têkoşerên din ên wêrek ên ku ji bo edalet û wekheviyê têdikoşin fêr bibin. Bibiryarbûn û dilxwaziya wî ku ji bo baweriyên xwe her tiştî xeternak bike ji bo me hemûyan mînakek îlhamê ye.

Em ji bîr nekin: hemî berxwedan piçûk dest pê dikin û hîn jî dikarin cudahiyek girîng bikin. Di cîhanek ku her ku diçe bi neheqî û zulmê re rûbirû ye, divê em ji bîr nekin ku wêrekî, deng û pabendbûna me amûrên girîng ên guherînê ne. Divê em zanibin ku her yek ji me xwedî wê hêzê ye ku cudahiyek çêbike. Ji ber vê yekê werin em ji van mînakên aktîvîst ên awarte îlhamê bigirin û ji bo afirandina civakek dadperwertir û berfirehtir hewl bidin. Ji ber ku di cîhaneke tijî bêedaletî de, çalakî ji banga çalakiyê wêdetir e; Ev pêdivî ye. Lê belê têkoşîna ciwanên kurd nîşan dide ku berxwedan di wateya serhildana ferdî yan jî kolektîf de ne tenê dikare bibe mijara jiyanê, di mezinbûn û pêşketina kesayetî de jî dibe faktoreke girîng. Lêkolîn jî destnîşan dike ku divê em ji guherînê netirsin, çi ciwan be, çi pîr.

Belê, divê em van wek firsendên avakirina berxwedana xwe û kûrkirina nasnameya xwe bibînin. Weke ku têkoşîna berxwedanê ya kurd nîşan dide, serhildan dikare mirovên berxwedêr ên ku karibin bi zehmetiyên jiyanê re rû bi rû bimînin û bi jêhatî û wêrekiya wan bi ser bikevin, derxe.

Aramê Elegezê

# Kurd bersiv dan kesên ku wan fêm nakin



Ber bi dawiya sala 2023'yan û despêka sala 2024'a ve heta roja îro mijara rojeva Tirkiye û bakurê Kurdistanê ya sereke kurd û partiya ku pala xwe dide gelê kurd yanî DEM Partiyê ye.

Hilbijartina gulanê ya 2023'yan a serokkomariya Tirkiyeyê û parlementoya wan de kurd û dostên wan, çepgirên sosyalîst di bin banê Partiya Keskên Çep de ketin hilbijartinê. Li ser vê dema buhorî gelek guftugoh, şîroveyên erenî û neyînî çêbûn, pêwîst nake ku mirov dubare bike. Piştî encamên vê hilbijartinê Partiya Keskên Çep hem di nav xwe de hem di nav gel de gelek civîn û nixandin, rexne, rexnedayîn pêş xist. Encamê van civîn û nirxandinan û pirsgirêkên ku dadgehên tirkan dixwestin doza girtina HDP'ê, herwiha ji boy derfetên polîtîka kirinê dest neçe nû xwe sazkirin û çûne kongrekî awerte. Di vê Kongrê da navê partiya xwe guherîn, rêvebirî û hevserokên xwe yê nû hilbijartin, pêywêrê nav xwe û programên xwe da guherîn çêkirin û bi navê HEDEP partiya ku wek Partiya Keskên Çep diyar kiribûn, nû kirin.

Dewleta tirk vê serkeftinê û vê nûjeniyê bi awayekî tengezarî û bêzarî bi rêya dozgerî û saziyên dozê partiyên siyasî dişopînin, navê partiyê ne pejirandin û xwest ku navekî din diyar bikin. Di encamê de rêvebiriya partiyê navê partiya kurt kir û wek DEM Partiyê aşkere kir.

Her tişt li gorî qanûn û destûrê pêk hatibû, lê derûniya mirovê spî, polîtîkvan û rojnemeger, her wiha çemkê-feresatê çepgirên lîberal, çepên-nasyonalîst, heta îslamîst, faşîst û wekî din, bêyî ku vê navê wetaya wê fêmkin, gorî zimanê tirkî wek 'çaya çêbûyî, an jî çaya tehma xwe girtiye' dest bi şîroveyan kirin. Hîn kesan bi zimanekî tinaz gotin 'min vî navê qet ne ecîband' an jî 'ev nav qet neket serêmin'. Ev pozbilindî, derûniyekî narsîst ku dixwaze her kes, her gotin li gorî zimanê wê be an jî divê tirkî be. Eger tirkî nebe dua nayê qebûlkirin.

Diyare wek hişmendiya mêrê desthilatdar, an jî li gorî teolojiya olî jin ji parsiyê mêr hatiye afirandin tev digerin. Dema jin bê mêr gavekî jî bavêje qir û hawar û pirsa 'ku de...?' dike. Niha ev tirkê pozbilind, narsîst, derûniya nexweşiya mirovê spî nikarin xwe rizgar bikin, wek ku kurd ji parsiyên wan çêbûyê ew çawa çi pênase dikin dixwazin kurd jî wek wan pênase bikin. Bes e ewqas pozbilindî, xwe kirine dewsa Xwedayê neteweya kurd. Lê kurd bi her tiştên xwe ji tirkan cudatir in. Divê êdî tirk dev ji pêşîra me berdin.

Di encamê de her çi gotin, qîr û hawar kirin jî ev hemû di gewriya wan de ma û Dem Partî û hilbijêrên xwe li gorî navê xwe, wetaya navê xwe ketin nav tekoşînê. Bi vê tekoşînê hilbijartinên 31'ê adara 2024'an ên xwecehî werçexekî dîrokî li Tirkiyeyê û bakurê Kurdistanê derxistin holê. Desthilatdariya 22 salan ya eniya faşîst û nijadperest a li seran serê Tirkiye û bakurê Kurdistanê têk bir û pozê mirovê spî bi erdê ve rakişand.

Li gorî vê encamê di roja yekemîn de torên sanal, rojnama û Tv'an de gotina "me hilbijêrên kurd, hilbijêrên Partiya DEM'ê fêm nekir, çawa dibe, bê Tv, bê rojnameyên giştî, her wiha hinde zextên li ser serê wan, çawa agahî dan mîlyonan, bi yek dengî helwest nîşandan. Her wiha, çawa metropolên cuda deng dan, Kurdistanê cuda deng dan û desthilatdarî cezakirin" li ser vê gotin û şîrovê gelek gotin hatin gotin, lê piskolojiya mirovê spî hîndê narsîst e ku zehmetî nade ku wate an jî mena navê DEM bizane, îcar ew ê li çawa fikir û ramanê gelê kurd fêm bike?

Tevî hemû dek, fêrbazî û diziyan jî encamên hilbijartinê bi taybet jî li bajarên bakurê Kurdistanê DEM serket, bi taybet jî li Wan û hemû navçeyên wê. Desthilatdariya faşîst kemîn û xefk a ku danîbû ber hibijêrên DEM û kurdan. Bajarên Qers, Bedlîs û Şirnex bi rêyên ber hilbijêrên barhilgir dest da ser, lê Wanê bi rêya qanûnên xwe bendê xefkê şikand, xwestin şaradarî desteser bikin. Encam da hêza gelê kurd ê çanda berxwedêr wek pêlekî xwe da der. Ev pêla berxwedêr hêz da hemû civaka Tirkiyeyê û bû goka tekoşînê, encamê vê da rejîma faşîst neçarma gav paş ve bavêjê, bendê xefkê bikşîne.

Ev fêmnekirina kurdan û têkoşîna wan bendê xefkê êdî xistiye sutiyê Tayîp Erdogan û hevalbendê wê. Wek werçerxana dîrokî; kê kurda fêmnekirîbe, kê ji bo çareseriyê nêzî kurdan nebe, encam sernîşiviye!

Niha pirs ev e; fêmkirina kurdan hîn de zehmet nîne. Bes gelo hûnê derûniya serdest, mirovê spî berdin an bernedin an jî hûnê nexweşiya şovenîzma netewperestî berdin an bernedin?

Ji bo fêmkirina serkeftinê li encamên Êlihê binêrin ku çawa aqilê mêrê pozbilind li hember jinên kurd ên têkoşer têk diçin. Çawa bi hezaran kurd têkoşîna jinên dîtin û li kolanan dirûşma Jin Jiyan Azadî bang kirin. Em dikarin bibêjin ku di vê hilbijartinê de kurd şeqamekî li suretê ên ku naxwazin kurdan fêm bikin, dan.

# Şaredarîyan de serokerdoxîye

Weçînayîşê 31ê adare qedîyayî. Bêusûlîyê îqtîdarî dewam kenê. Şaredarîyanê ke derbasê muxalefetî bîyî de xeylêk bêhuqûqîyî qewimîyayî. AKPyî pergalê serokerdoxîye awan kerdo

| Merkezê Xeberan



Rejîmê Erdoganî 21 serrî yo dizdîye keno. Heqa şarî weno û her tewr çimeyanê pêroyîyan seba menfaetê xo xebitneno. Îdareyê Erdoganî hetêk ra bêrayîrîye kerde, hetekê bînî ra şar xapit. Labelê na polîtîkaya binkore weçînayîşanê herêmkîyan ê 31ê adare de pûç bîye. Hem Tirkîya hem zî Kurdistan de xeylêk şaristanan de şarî AKPyî rê “nê” vat. Netîceya weçînayîşan de eşkera bî ke rejîmê Erdoganî şaredarîyan de pergalê luks û “sefahatî” awan kerdo. Senî ke Erdoganî seba xo serayî dayî viraştene, şaredaranê AKPyî zî serayê xo viraştê. Cor ra heta cêr pêro dewlete boye dana. Seraya Erdoganî îlhamê bêrayîrîye dana. Ge-ge tirkî de vanê “Biza ke vejîyena serê dare ra bizêka/o ke bask ra ewnena/o bena/o”.

Merdim gama ke nimûneyan vîneno mat beno û eynî wext de hêrs beno. Mîsal şaredarîya Sancaktepe de şaredara AKPyî Şeyma Dogucu îsrafêko gird kerdo. Şêwirmendê Ekrem Îmamoglu Necatî Ozkanî pare kerd ke Dogucu qatê îdareyê xo de cuyêka lukse ciwîyaye. Uca de kulindêka girde, odayê arisîyayîşî, odayê meqamî û werdî bala merdimî anjenê. Yew zî Şeyma Dogucu seba xo “jakuzî” dayo awankerdene. Nê merdimî hetêk ra vanê ê “dîndar” ê, hetekê bînî ra îslamî binpay kenê. Ayeta 31. a sûreya Arafî de nusîyeno ke “Ey domanê Ademî! pay bikerê, biwerê, bişimnê la îsraf mekerê. Homa înanê ke îsraf kenê ra hes nêkeno.” Şaredarê Erdoganî hem xo sey “dîndar” mojnenê, hem zî duştê dînî yenê. Na dîndarîye nîya, dînbazî ya. Yanî îslamî seba luksê xo şuxilnenê.

**Deştadarê de keyfîyet**

Îsraf û keyfîyeto bîn Şirnex de qewimîyayî. Xora yeno zanayene ke şaredarîya Şirnexî de 8 serrî yo îdareyê qeyûmî û AKPyî est bî. Bajarekê Deştadarê yê Şirnexî de şaredarê AKPyî Abdulkadîr Balîcayî “masaya okeyî” eşta zerreyê awanîye. Seke awanîya şaredarîye ravurîyaye bi kafe. Şar vano ke çend serrî yo bajarekî de tu xizmetêk nêdîyeno. Seba ke rayîr çin o, roniştoxê Deştadarê kerreyan ser o rayra şinê. Hemşaredarê DEM Partî Fahrettîn Akman dîyar keno ke “awanîya şaredarîye herinda awanîya xizmetî bîya awanîya keyfî”. Rixmo ke şaredarîya Deştadarê de traktore, çemçik û wesayîtê çopî est ê, qet nêameyî şuxilnayene û pêro zengin bîyî. Yew zî faturayê elektrîkê şaredarîye nêdîyayî û deynê ci bîyo 600 hezar lîra.

**Cizîr de heramîye**

Şirnex de xeylêk bêrayîrîyî û bêusûlîyî qewimîyayî. Mîsal şaredarîya Cizîrî de zî “dizdîye” peyda bîye. Dayîşê mazbata ra di saetî verî, eşkera bî ke qeyûma Cizîrî Nazli Demîre fekafek 30 mîlyon lîra xerc kerdo. Demîre qaymeqamîya Cizîrî kerdêne û sey qeyûme ameye tayînkerdene. Bi îxtîmalêkê girdî cinîya “neteweperest” a. Seba erdê “Tirkîya” xo kiştêne. La se kerd? Pereyê ke bankaya şaristanan ra ameyî, bi hawayêkê keyfî serf kerdî. Nê neteweperestê tirkan dişmenê nê erdî û şaranê Tirkîya yê. Hişmendîya înan de zafane “talankerdiş, dizdîye, kiştiş, xapxapokîye” est ê. Çike netewe-dewlete hişmendîya nîyanêne awan kerde. Mîyanê seserre de Tirkîya de “rogue nation” yanî şaro heramî virazîya. Şar îdarekaranê dewlete ra perwerde gêno. Ê diznenê, şar se keno? Na dizdîye rewa hesibneno. Ê qir kenê, şar qirkerdişî zerreyin keno. Ê heramîye kenê, şar nê reftarî xo rê sey “rayber” vîneno. Netîce de kleptokrasî û şaro heramî ameyî awan kerdene. Bi taybetî rejîmê Erdoganî Tirkîya û Kurdistan de tu erjêk nêverada. Ne exlaq, ne etîk, ne huqûq, ne norm, ne demokrasî, ne edalet, ne azadîya qiseykerdişî, ne aramîye est ê. Her çî binê linganê Erdogan û “embazanê” ci de ame pelixnayene. La şarî hêvîdar ê ke demê nêzdî de her çî do bêro bedilnayene.

# Mizgînîya wisarî: **Kenger**

| Abdullah Esen



Xozaya Kurdistanî de vaşê ke demserra wisarî de merdiman rê benê şîfa zergun bîyê. Cayê arêdayîşê nê vaşan de sixletêk est o. Şarî ra tay seba werdê xo şino zozanan û tay zî seba ke îdareyê xo bi rotişê vaşan bikero şino. Amed de zî rewşe wina ya û vaşê ke yenê werdiş, zergun bîyê. Kengero ke zafane herêma Qerejdaxî ya Amedî de zergun beno, hem beno werd û hem zî beno çimeyê îdareyî. Kengerî ra tena werd nêvirazîyeno, bezreyê ci ra qehwe û şitê ci ra zî benişt yeno viraştiş. Kenger demserra wisarî de vejîyeno û seba kesanê ke heywankarîye kenê beno wesîleya îdareyê demkî. Gulik û kengerê ke zafane Kurdistan de yenê heskerdiş, wextê xo de xeylê biqîmet ê û xeylêk cayan de bi vayîyêke zaf zêde yenê rotiş. Kîloyê kengerî yo ke dormeyê Qerejdaxî de zêde yo bi 100 lîreyan yeno rotiş. Kengero ke xoza ra yeno arêdayîş vayîye vera nîno herînayîş û werdiş.

Hemwelatijo bi nameyê Osman Çigo ke karê citkarîye keno, derheqê babete de qisey kerd û da zanayîş ke vayîye vera kenger nîno herînayîş ke şar biwero û hemwelatijî nêeşkenê sey serranê verênan bi asanî kengeran bigêrî û biwerî.

Osman Çigî dîyar kerd ke kengero ke Kurdistan de zergun beno sey mizgînîya wisarî yeno zanayîş û wina qisey kerd: “Kenger her herêma Kurdistanî de zergun beno û zaf yeno heskerdiş. Kengero ke herême de hende yeno heskerdiş û tamê ci weş o, dezgehanê bazarê semtan de yeno rotiş. Wexto ke varan vareno û hewa germ beno kenger zî zergun beno û binê vewra ke helîyena de sereyê xo berz keno. Kenger herêmanê berzîyan ê girê koyan de zergun beno. Kerengo ke zergun beno, hetê hemwelatijan ra bi xilçeyan yeno arêdayîş. Dima ra zî bi xêşeyan yeno bazaran û bi kîlo yeno rotiş.”

**‘Kenger sey mizgînîya wisarî yo’**

Çigî da zanayîş ke kenger tewr zêde werdê herêmî de yeno şixulnayîş û wina qiseykerdişê xo dewam kerd: “Wexto ke kenger vejîyeno, merdim zano ke wisar ameyo. Coka ra kenger sey mizgînîya wisarî yeno zanayîş. Cinî, doman û şivan şinê zozanan. Serê sibayî ra heta ereyê şewe kengeran arê danê. Tay seba werdê xo, tay seba rotiş û tay zî seba îdareyê xo kengeran arê danê. Tena kenger nê, na demserre de sewbîna xeylê vaşê bîn ê ke yenê werdiş, yenê arêdayîş. Nê vaşê ke koyan ra yenê arêdayîş bazaran de pê kîloyan yenê rotiş. Kîloyê înan 100 lîre yo û tay cayan de pê dolar daxî yeno rotiş.”

**Herînayîşê serê rayîrî**

Çigî qiseykerdişê xo yê peyênî de ard ziwan ke her serre qezaya Qerejdaxî de hemwelatijê ke herême de ciwîyenê hem heywananê xo na herême de çerênenê û hem zî kengeran çinenê. Çigî derheqê karê xo de wina peynî kerde: “Ez hema hema roje de di xilik ya zî hîrê xilik kenger çinena. Tena hemwelatijê ke herême de ciwîyenê nê, seba rotişê înan teberî ra xeylê kesî yenê. Ez hem heywananê xo çerênena û hem zî kenger arê dana. Ez nê kengeran heme roşena. Xeylê reyan kesê ke serê rayîrî ra derbaz benê zî kengeran herînenê.”

## Dewey Ma



Cemîl
Oguz
cemilo@diyarname.com

# Tramway

Dinya de heme bajarê girdî bi sîstemanê reyanê hesinî şarê xwu benê û anê. Dinya de welatê raverşiyayey zor danê enî sîstemî û xizmet kenê. Metroya yewîne di serey 1863 de Londonê Îngilistanî de hamiya viraştişî. Tirkiya de zî eno sîstem henî raver şiyo. Stenbol de serey 1989 de metro hamî viraştişî.

Enqera de 1993 de temelê metro hame eyştişî, serey 1996 de kewt faaliyet. Tirkiya de 12 bajaran de metro, yan zî tramvay, yan zî wirdî estê. Ê bajarî eni yê: Stenbol, Îzmîr, Enqera, Bursa, Edene, Eskîşehîr, Kayserî, Samsun, Konya, Antalya, Entab, Îzmît.

Ma çi rê qalê tramvay yan metro kerd? Ma vacin…

Seran ra serey 2016’i ya. Hema dewlete bi kayûman dest nêdaw serê şaredarî kurdan. Hemşaredarê Bajarê Girdî yê Amedî Firat Anli ÎMC TV (20.06.2016) de ana vat, “Projeya ma ay tramvay est a. Eno hîri seriyo hedri ya, ana projeyke baş a di zehf pêşbaziyan de biya yewîn e. Ma proje berde Bankeya Dinya, di pêşbazî înan de zî kewte derece û Bankeya Dinya qeybî viraştişê tramvay 300 mîlyon dolar pere bi deyn dana ma. Qeybî ke perey bêrê gere Bankeya Bajaran ay Tirkiya peyman îmza bikero, la hikumet nêverdeno îmze bêro eyştişî û perey bêrê. Wexto mesela Amed bo zey hikumetanê bînan AKP zî eynî çî kena. Bawnê Serokomar, Serokwezîrê Tirkiya heme bajaran de benê esparê metro û pesnê viraştişê metro danê la çirê destûr nêdanê ma? Qey ma Etopya ra hameyê?”.

Erê destûr nêda ke şaredarê kurdan Amed de tramvay virazê. La dima ra se bî? Dima ra Hevşaredarê Amedî Gultan Kişanake û Firat Anli hamey girotişî, sebê çiyê ne çî. Kayûman gorey zerey xwu gamî eyştî û înan zî ne tramvay viraştî, ne zî waşt virazê.

Verendamê AKP’î yê Şaredariya Girde ya Amedî serey 2019 de, wextê propagandayê weçînayişî de projey tramvay girot miyane sozanê xwu, la di serey 2019’inan de reyna partîya kurdan bi ser kewte û sera çende aşmî derbas nêbî hikumetî reyna kayûm eyşt serê Amedî. Kayûman zî qe Amedî rê xebatêke ana muhîme nêkerde.

Çînan bîn: Miyanê 12 bajaranê ke metro û tramvay tede estê de tenî Entab ê kurdan o û ê bînî bajarê tirkan ê. Entab zî eno 2004’an ra nat destê AKP’î de wo. Weko bin bajarê bînî ê tirkan ê. Entab bi 3 sey hezarî Amed ra pîl o. Bajarê ke metro tede estê, nifûsey Amed û Kocaelî hema hema zey yewbîni ya. A çaxî perse ene wa? Çirê Amed de nêverdenê tramvay bêro viraştişî?

Mesela zehf zelal a: Îmajê tramvay-mero qeybî bajaran zehf pîl o. Kam virazo ê kunê miyanê tarîxe. Loma zî hikumet nêwazeno şar vaco, “Bewne partî kurdan bajarê xwu de tramvay viraşt.” Şaredarî qe kar nêkero zî, projeyke zey metro yan tramvay virazo bes o ke dinya qal bikero. Loma ene xale muhîm a. Loma zî enka ke şaredarê newey Amed de hamey serê karî, ma waşt ene xala muhîme reyna biyarê vîrê înan.

Di miyanê panc seranê vernî ma de şaredarî helbet gere zehf çiyan bikerê, la zey merdimê ke Amed ra hêvî û waştişê min hêja Serra Bucak û Dogan Hatun ra eno wo, serê tramvay de bişixuliyê û bi awayke virazê.




# Tiştanok (mamik)

Gelî hêjayan mamik  an jî tiştanok çandeke kevnar a gelê kurd e û berê di civat û şevbêrkên xwe de mamik ji hev dipirsîn. Me dîsa ji we re çend tiştanok anku mamikên xweş amade kirine.  Em hêvî dikin ku bi dilê we be.

***1-Mamê mino***
Kadînek min heye tijî peyve
Tijî peyve, lê ku ti jê
dernexî ew dernakeve
Ew çi ye?

***2- Tiştek heye***
Kaniya jiyanê ye
De bêje ew çi ye?



***Bersivên me ev in:***
***1-*** Pirtûk ***2-*** Dayik

# Tube û duayên dirêj


**Hesen Hemkê**

Li hecê mirovekî sûriyeyî û yek afganî li kêleka hev rûniştibûn û ji xwe dua dikirin û istixfara xwe dikirin.

Yê afgan ji yê sûriyeyî re got: “Ma tu dibêjî çi em heta limêja esrê li vir bin û istifara xwe bînin.” Yê sûriyeyî got: “Baş e em wiha bikin.” Piştî esrê yê afganî got: “Bira ka em heta limêja eşa jî li vir bin belkî Xwedê tuba me qebûl bike û me efû bike.” Yê sûriyeyî dîsa got: “Tiştek nabe û heta eşayê man.” Piştî eşayê yê afganî got bira ka em heta serê sibehê dewam bikin. Yê sûriyeyî xeyidî û got; “Qurbana çavên te, tu min û xwe dikî wek hev. Tu ji Qendeharê hatiyî bi kêmasî te sed mirov kuştine, lê ez pepûkê xwedê min di jiyana xwe de tenê carekê bîra vexwariye û ew jî bi şaştî bû.



# XAÇEPIRS



## JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ DE

**3-** Hemû, giştik **5-** Xwarina sewalan **7-** Qirêj, lewitî **8-** Daçekek **9-** Serok **13-** Welateke ku bi darvekirinê navdar e **14-** Pêxemberek **16-** Cih, mekan **19-** Xeran, perîşan, wêran **20-** Agir **21-** Cureyekî bihokên biçûk, ji ber qirêje dikeve nav porê mirov **22-** Rayeyeke desthilatiyê **25-** Reşahiya mirov ya li ber tav û ronahiyê çêdibe **26-** Çîk, tişt, ewk (Li herêma Efrînê ew gotin tê bikaranîn) **28-** Talanker, şelîner

## JI JOR BER BI JÊR DE

**1-** Kesên ji Mêrdînê
**2-** Kesê ku li pêşiya cemaetê limêj dike
**3-** Hewcedariya avê
**4-** Îrade
**6-** Kar û berxên ku ne di dema xwe de çêdibin
**10-** Çala avê
**11-** Rih
**12-** Vexwarina sereke ya pitikan
**15-** Meheke biharê
**17-** Xelkên bajarekî, an jî devereke
**18-** Tiştê ku mirov pereyên xwe dixe wan, cêb
**20-** Bajarekî bakurê Kurdistanê
**23-**Rengek
**24-** Cihê îbadetxaneya xiristiyanan
**27-** Rojeke hefteyê

## Bersiva hefteya borî






**Hilmî Akyol**

# Cendirme û nokên qelandî

Li bajarê Mêrdînê cendirme diçin gundê Banqîrê. Ka êdî ji bo çi îşî çûne gund em pê nizanin. Peya çûne li wan dibe derengî li gund dimînin. Aciz bûne dê wê şevê li wir rakevin. Diçin malekê dibin mêvanê wan. Êvarê ji xwediyê malê re dibêjin:

- Ji me re nokan biqelînin.

Mazûvanê wan ji wan re nokan diqelîne. Ava wan jî di kûz de ye. Ava kûzan jî sar e. Nokê qelandiyê şor jî bi ava sar re werin xwarin pir xweşin. Cendirme dikevin ser leganek nokan dixwin û avê vedixwin. Dixwin û avê bi ser de vedixwin. Hingî pir dixwin dinepixin. Nava wan diêşe. Di nava wî de dibe xurxura bayê. Û ba bi ber wan dikeve. Bi dengê bilind tir û tir û tir. Tiran dikin. Hundir bi ser bîna tirên wan dikeve. Belengazê mazûvan newêre ji wan re bibêje:

- Hey kûçikbavno herin derve tirên xwe bikin.

Ji bîna tiran pozê xwe digirin. Cendirme her yekî darek digire, li mazûvan û zarokên wî dixin. Mazûvan newêre ji wan re bibêje:

- Hûn çima li me dixin?

Cendirme dibêjin:

- Bi quran hûn biqîrin an jî bigirîn û gundî pê bihesin werin û hûn bêjin em ji bo çi li we dixin. Em ê we bikujin û li wan dixin. Ew jî ji ber darên cendirmeyan dikin qêrîn û dibêjin:

- Hewar e, hewar e.

Cîranê wan diçin mala wan. Ew jî ji bîna pozê xwe digirin. Bala xwe didinê, cendirme bi daran li wan dixin.

Mazûvan ji cendirmeyan re dibêje:

- Yaw we got çi bikin û me çi kir. We çi kir û hûn çi dikin û çima hûn çi dikin?

( yanî law we got noka biqelînin, me nok qelandin. We xwar û hûn nepixîn û hûn tiran dikin. Hûn çima li me dixin?) Wê gavê gundî nizanin dibêjin çi, ji wan fêm nakin,bê ji bo çi li wan dixin.

Cendirmeyên li wan dixin ji gundiyan re dibêjin:

- Kuro hûn bi çi zimanî bi hev re dipeyivin. Em ji we tiştek fêm nakin. Xwediyê malê dibêje:

- Cîran sibê sibê ez ê bêjim. Cendirme hey li wan dixin.

Dibêje sibe cendirme diteqizin diçin. Cîran û gundiyê wan diçin dipirsin dibêjin:

- Law îşev sûcê we çibû? Cendirme çima li we dixist? We çi kiribû? Hûn bi zimanekî dipeyiviyan me ji we fêm nekir, ew kîjan zimanî bû, çi dawa bû?

We digot;

-Yaw we got çi bikin û me çê kir.  We çi kir û hûn çi dikin û çima hûn çi dikin?

Xwediyê malê dibêje:

- Cîran qet nepirsin. Wan kûçikbavna ji me re gotin;

-Ji me re nokan biqelînin.

Me ji wan re nok qelandin. Fena keran ketin ser legana nokan xwarin qedandin. Bi ser de ava kûzek jî qedandin û nepixîn û tir kirin. Tir kirin hundir bi ser bînê ket. Û dar girtin û li me xistin. Gotin;

-Eger hûn bêjin cendirma nok xwarine û tir kirine loma li me dixin, em ê we bi daran bikujin. Me jî newêribû bigota ji bo tirekiya xwe li me dixin.

Me jî wisa got.

Yanî me got:

- Law we ji me re got nokan biqelînin. Me nok qelandin. We nok xwar û we tir kir. Hûn çima li me dixin.

# Ferîşteyên Mirinê yên Înîsherînê

Li pêş şerê Padraîc û Colm, li paş şerê navxweyî yê Îrlandayê ku herkesî bêzar kiriye. Şerê navbera wan jî her ku diçe gurtir dibe. Ji ber ku têkiliya wan baş e, şagirtê muzikê bi derewa bavê wî li ber mirinê ye ji giravê dûr dixe



Mazlum Baran



Filmê Ferîşteyên Mirinê ên Înîsherinê (The Banshess Of Inisherin ) di sala 2022'yan de ji hêla Martîn Mc Donagh ve hatiye çêkirin. Herwiha senaryo jî ew bi xwe dinivîse. Di fîlm de em bajarokekî biçûk ê giraveka Îrlandayê ye dibînin. Jiyana li bajarokê li giravê jiyaneka rutîn e, seeta nîştecihên wê yê kar ya çûna meyxanê, têkiliyên mirovan axaftinên wan hemû diyar in. Diyar e demeke pir dirêje jî wiha berdewam dike. Em bi serkarakterê fîlmê, bi Podraic re tevlî jiyana giravê dibin. Podraic kesekî ji rêze, dilpak e, zêde ne bi aqil e. Bi ker û çelekên xwe mijûl dibe, dema ji kar û bar mayî jî bi hevalê xwe ê herî nêz Colm re derbas dike. Hevalê wî Colm mûzîkjen, hunermend û entelektuelek e ku dem bi dem li meyxaneya bajarokê Înîsherinê li kemanê dixe. Her du hevalên ku tim bi hev re ne, seeta wan a çûna meyxanê jî diyar e. Heta roja ku fîlm dest pê bike ku Colm dawî li vê hevaltiyê tîne. Padraîc kesekî kawik e, bi çêlekan re mijûl dibe, şîrê wan difroşe û wisa debara xwe dike. Colm berevajiya Padraîc miroveki giran e, zana û hunermend e.

**Colm tiştekî tenê dibêje**

Ji sehneya yekemîn em dibînin ku Colm naxwaze hevaltiya xwe ya bi Padraîc re berdewam bike. Padraîc metel dimîne, fêhm nake û ji du Colm venaqete. Padraîc tênegahije bê ji bo çi hevalê wî yê herî nêz ku her roj bi hev re ne bi carekê xwe jê dûr dike. Lê Colm bêyî sedemekê nîşan bide dibeje ku hevaltiya wan qediyaye û naxwaze wî bibîne. Li gorî Padraîc, wî tiştekî şaş nekiriye û ji Colm hez dike, naxwaze hevaltiya wan biqede. Lê Colm bi tu awayî bi paş ve gav navêje, daxwaza xwe ya hevnedîtinê û birîna axaftinê dubare dike her carê. Tu xeletîya ku Padraîc kiriye tune ye ku ji bo wê ji Colm lêborinê bixwaze. Colm tiştekî tenê dibêje, ji hevaltiya wî bezar bûye û êdî naxwaze. Dema ku pê re derbas dike wek demeke berhewa dibe dibîne.

**Tirsa mirinê - tunebûne**

Sîobhana xwişka Padraîc ku ji mirov û jiyana giravê bêzar bû ye û dixwaze dev ji wir berde, ji bo Padraîc bi Colm re diaxive lê bi kêr nayê. Colm dibêje ku ji axaftinên vik û vala ên Padraîc bêzar bûye û êdî dixwaze bi muzikê re mijul bibe. Pîr dibe û tirsa mirinê- tunebûne ew dorpêç kiriye. Naxwaze tune bibe, lewma dixwaze bi stranên ku çê dike nemir bibe. Bi vî awayî piştî mirinê dê nêyê bîra kesekî, ji vê ditirse. Siobhan ji jiyana li giravê qet hez nake, têkilî bi niştecihên giravê re deynane, carînan ji bo ku rastî wan nê di rê xwe de xwe ji wan vedişêre, ji xwendina pirtûkan hez dike. Piştî ku derfeta wê çê dibe giravê terq dike, dema diçe dixwaze Padraîc ji bi xwe re bibie lê Padraîc qebûl nake. Nikare dev ji Colm, kera xwe ku pir jê hez dike û çêlekên xwe ku berde. Dixwaze ji bêhevîbûn, kîn, tenêbûna xwe ya li giravê li pişt xwe bihêle û biçe balê, lê Padraîc nikare dev ji giravê berde.

**Pêçika xwe jê dike**

Tevî atmosfera giran ya fîlm, vegotineka mizahî heye. Hewaye destpêkê ronak e, keskesor heye û bi liv û tevger e lê her ku diçe tarî dibe. Li pêş şerê Padraîc û Colm, li paş şerê navxweyî yê Îrlandayê ku herkesî bêzar kiriye. Şerê navbera her duyan jî her diçe gurtir dibe. Padraîcê dilpak, ji bo ku têkiliya wî û Colm baş e, şagirtê muzikê bi derewa ku bavê wî li ber mirinê ye ji giravê dûr dixe. Bi gotina Domînîc, êdî ew jî dibe ên wek giravê ne kesê herî baş e, ew jî xirab e.

Ne Padraîc dev ji israra xwe berdide ne jî Colm ji biryara xwe vedigere. Colm hew îdare dike û Padraîc tehdît dike; heqe ev israra wî berdewam bike wê pêçika xwe jê bike. Padraîc jê bawer nake ji du Colm venaqete. Colm wek ku gotibû, bi meqeseka kevn û mezin pêçika xwe jê dike. Şerê wan ê bi gotinan vediguhere şerekî bi xwîn. Padraîc nizane çi bike, metel dimîne lê ji du Colm venaqete. Colm pêçikên mayî jî jê dike û diçe davêje deriyê mala Padraîc. Kera Padraîc ku pir jê hez dike, gelek caran ew di nav malê de dihewîne dema pêçikên Colm ku diavêje derî dixwe dimire. Padraîc hêrs dibe, wê mala Colm bişewitîne.

Atmosfera fîlm tarîtir e êdî, asimanên Înîsherinê bi ewr e, mirov naxwazin bi hev re têkildar bin, gelek caran ji bo ku rastî hev neyên xwe ji hev vedişêrin. Dem dem bi darê destê xwe jineka pîr ku qasida mirinê ye digere. Ew ferîşteya mirinê ye, dema ku tê dîtin dê di demeke nêz de nasekî/ê wan kesên ku wê dîtine bimire. Ferîşteya mirinê, bêhêvî bûn û reşbînîya ku li giravê belav bû ye temam dike. Her wiha dengên bombe û çekan jî kêm nabe.

**Şervanên ÎRA'yê ne**

Îrlandî li hemberî dagirkerên îngilîz demeke dirêj şer dikin, piştî şer li hev dikin. Lê şervanên Îrlandî dibin du beş, ên peymana bi îngilizan re qebûl dikin û ên ku li hemberî vê peymanê derdikevin. Du nav her du aliyan de jî şer dest pê dike. Kesek nizane bê çima Îrlandiyên ku li hemberî Îngilizan bi ser ketine çima ketine qirika hev û hev dikujin. Ev şer ji bo niştecihên giravê bêwate ye. Ji bo ku pênç şêrvanên Îrlandî bên darvekirin bangî polîs dikin, polîsê şidetparêz bê xem e, wê ji bo darvekirina pênç şêrvanên ÎRA'yî biçe lê ên ku tên darvekirin ÎRA'yî ne an hêzên Hikumeta Îrlandî ne nizane, ne girîng e jî ji xwe. Tevî ku em bi dengên bombeyan de, çekan û axaftinên niştecihê giravê di bin bandora şer de ne, lê tu carê em ne şervanên ÎRA'yê ne jî hêzên Hikumeta Demdar ya Îrlandî dibînin. Em vî şerên navxweyê yê Îrlandayê di nav her du hevalên herî nêz de dibînin. Îrlandiyên bi salan ku bi hev re di heman çeperê de li hemberî dagirkeran şer dikin dema ser dikevin berê çekên xwe didin hev. Colm û Padraîcê ku bi salan hevaltiyeka wan a xurt heye bi carekê pêv diçin.

Derhêner vî şerê dijwar û bi êş bêyî ku eniya şer, şervanan, çekan nîşan bide bi awayekî serkeftî di bajarokekî xeyalî ê giraveka Îrlandayê de nîşan dide. ji destpêka fîlm heta dawiyê rageşî qet kêm nabe, şerê navbera Colm û Padraîc her diçe gurtir dibe. Tevî vê çîroka dijwar şêweyek pêkenî heye lê belê erjenga şer jî kêm nabe. Dawiyê em wan li perava behrê dibînin, dengên çek û bombeyan jî êdî nayê bihîstin.

## Aforîzma

Josh Billing

*Jiyan kurt e lê dîsan jî têra hindê dirêj e ku mala mirov wêran bike.*

*Ji bo ku tu navşirîn bî, bi aşkerayî bide û bi dizîkî bistîne.*

*Heke heywanan jî aqil heba, ew jî dê mîna me bêaqil ban.*

## Gotinên pêşiyan

** Kes wek jinê bi hevjînê xwe nizane.*

** Masiyê ku ji avê derketî ji agir natirse.*

** Mar e, ne cih û ne war e.*

# Memê û Zînê

| Servîsa Çandê

Lewre folklor û mîtolojiya rehên ziman û gelan in ku bi qasî geşbûna destan, efsane û çîrokê ew gelî dertêne ser rûyê erdê. Destana Memê Alan yek ji wan e ku rehên wê hezar sal in. Wekî di Şahnameya Kurdî de behsa Rustemê Zal bi çendîn cûreyan tê kirin, her wiha destana Memê Alan jî bi çend şiklan hatiye gotin û bi dengbêjkî jî hatiye stran. Her wiha di zargotina kurdan de nexasim Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl û helbet Qanatê Kurdo ev destan jî qeyd û zebt kirine çawa ku Roger Lescot ji çend dengbêjan heman destan derbasî nivîsê kiribû. Ehmedê Xanî yê direwşen, berhema Mem û Zîn li ser vê destanê bi cîhanbîniya xwe ava û ebedî kir.

Emînê Evdal, Memê û Zînê zehf di cî de wekî Poêma Cimaeta Kurd bi nav kiriye. Wî ji lêkolîn, nivîs û bihîstinên xwe ev berhem bi qaydê û usûlên nezmê daye rûniştandin. Emînê Evdal ê etnograf, pedagog, zana û helbestkar, li gel Heciyê Cindî ew pirtûka mezin, Folklora Kurmanca, ji havênê zargotina kurdî rakirine ser piyan. Lewma jî ev poêm, ev berhema han e nemir ji destê Emînê Evdal zehf rihet kamil bûye ku piştî deh salan xwe gîhandiye vî berî zimanê me yê qedîm. Ev pirtûka helbestan a Emînê Evdalê ya Memê û Zînê ji Weşanên Nûbiharê derketiye. Bêguman her berhemeke kurdî di bingeha xwe de ji bo wêje û dîroka kurdî gelekî girîng e.




## Ferheng

## Antînomî

**Nakokiya ku divê aqil bikeve nav ji bo analîzkirina mutlaqê... Ev têgeheke fîlozofê navdar Immanuel Kant e.**

**Li gorî ramanwerê Alman Immanuel Kant, hemû pêşniyarên di warê mutlaqê de bi nakok in û di nav pevçûnê de ne. Ji ber ku ev pêşniyar nayên ceribandin, hevrehên wan jî dikarin bi heman hêzê dikare werin pêşde birin. Argumanên kozmolojîk ên li ser bingeha lîstikên peyvan dikarin ji bo her du pêşniyarên dijber werin pêşandan.**

**Kant, ji kirdeyê û hem jî ji bireserê re hin nenasbûnekê vedibêje û ji van pêşniyarên kozmolojîk re antînomiyên aqilê pak bi nav dike û di nav çar antînomiyên sereke de kom dike.**

**1) Antînomiya Çendahiyê: "Gerdûn sînordar e - gerdûn bêsînor e"**

**2) Antînomiya Çawaniyê: "Made ji atomên ku nayên dabeşkirin pêk tê - made bêsînor dabeş dibe."**

**3) Antînomiya Pêwendiyê: "Her tişt bi neçarî têkildar e - tiştek ne pêdivî ye."**

**4) Antînomiya Modalîteyê: "Bêwextiyek heye ku sedemê gerdûnê ye - sedema gerdûnê ne heyînek pêdivî ye."**

**Li gorî Kant, ev antîmoniya tez û her weha dijberiya van pêşniyarên ku li derveyî ezmûna hestî ne, ji ber ku nikarin ji sînorên ezmûna hestiyariyê ya tavilê derbas bibin, bi heman rengî dikare were îsbat kirin ku di vê rewşê de hem tez û hem divê argumana dijber rast bê dîtin., ku ev antînomî ye...**

xwebûn

15 - 21 Nîsan 2024 / e-mail: rojname@xwebun.org / Hejmar: 226

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Kadri Esen
**Sorumlu Yazıişleri Müdürü:** Mehmet Ali Ertaş
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw
Adar Gulan
Heval Dilbihar
Ehmed Huseynî
Kakşar Oremar
Selîm Temo
Dr. Zerdeşt Haco
Munewer Azîzoglu Bazan

**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli
**Yönetim Yeri:** Fırat mahallesi 499/1. SK 100 Evler Sitesi No: 6 F **Kayapınar/ Diyarbakır**
**Baskı:** Dicle Basın Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Blv. Batıkent Yapı Koop. 26/UA **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsyar e.*

Ji bo abonetiyê
**Tel:** 0 (541) 806 84 85

# Kemaneceneko dêrsimij: Silo Qij

## Şaîr û kemanecen Silo Qij serra 1912yî de dewa Milanî ya sancaxê Dêrsimî de ame dinya. Şîîr û deyîrê ey hoka kirmancîye ra zaf rûmetdar ê. Şaîrî 14ê kanûna 2019î de dinyaya xo bedilnaye



Dr. Îsmet Konak



Tarîxê kirmancan xeylê rengin û dewlemend o. Cayê Dêrsimî zî nê tarîxî de balkêş o. Hetê kultur, ziwan û tradîsyonan ra cîya yo. Dêrsim de xeylêk şexsîyetê bêmergî û rûmetdarî ciwîyayî. Mîyanê înan de nameyê kemanecen û şaîr Silê Qijî (Silemano Qij) deyra muhîm o. Ma do na meqale de qalê cuye û hunerê Silê Qijî bikerê.

Derheqê cuya Silê Qijî de xeylêk cigêrayîşê akademîsyen Dr. Daîmî Cengîzî est ê. Goreyê zanayîşê Cengîzî Silo Qij serra 1912î de dewa Milanî (Milû) de ame dinya. La no tarîx mîyanê cigêrayoxan de binîqaş o. Mîsal Martin Greve eserê xo yê bi nameyê "Neither Âşık nor Dengbêj- The Lament Singers from Dersim (Tunceli) (Ne Aşik, ne zî Dengbêj – Dêrsim ra Deyîrbazê Şînî)" de dîyar keno ke Silo Qij serra 1918î de maya xo ra bî.

Daîmî Cengîz nuseno ke pîrika Silê Qijî 21ê adare de destê sodirî de şîya hênî. Aye nîyadayo ke dar û ber ameyo secde. Goreyê îtîqatê elewîye cade çitike sereyê xo ra veta, eşta serê dare û nîyazê xo kerdo: "Heqo teala! To ra yew miradê mi est o, wa neslê mi rê şaîrîye bide". Na çarçewa de Silo Qij vano ke nê miradî ra tepîya pîyê ci Silê Gurî, bixo, lajê ci Heyder û tornê ci tradîsyonê şaîrîye domna zî domnenê.

**Pîyê Silê Qijî û Şêx Seîd**

Cuya Silê Qijî ser o çimeyêko tewr girîng bêguman belgeyî yo ke bi destê Bulent Boralî ameyo antene yo. Nê belgeyî de kemanecen xeylê melumatanê balkêşan dano. Silo Qij vano ke ey nameyê pîyê xo girewto. Ey ra ver pêro birayê ci merdê. Gama ke Silo Qij bîyo, dormeyê dewa înan de zanyarêkî vato ke nameyê pîyê ci bidê ey ke wa nêmiro. Bi nê hawayî nameyê pîyê ci Sileman dîyayo ey. Silo Qij belgeyî de cuya pîyê xo ser çîyêkê balkêşî pare keno. Vano ke pîyê ci demê Xoverdayîşê Şêx Seîdî de bi fermanê dewleta tirkan erşawîyayo bi Palu. Tîya de tewrê tayê pêkewtişan bîyo û dima agêrayo. Gama ke agêrayo, dinyaya xo bedilnayo. Zanîyeno ke wextê Xoverdayîşê Şêx Seîdî de nêzdî 2 hezar dêrsimijan hemverê Şêxî lej kerdbî. Tayê cigêrayoxî nusenê ke îdareyê Mustafa Kemalî seba ke dêrsimijan qanalîze bikero, argumanê "xîlafet û şerîatî" sey hacet şuxilnabî. La pêro dinya zana ke Şêx Seîdî eslê xo de azadîya Kurdistanî armanc kerdbî. Bêguman seba girewtişê paştîya şarî vatişê dînî şuxilîyayî.



**Eşîra Mîlanî**

Silo Qij belgeyî yo ke cor de behsê ci bî de vano ke pîyê ci Xoverdayîşê Şêx Seîdî ra yew serre dima yanî dormeyê 1926î de merdo û o wext bixo 10 serrî bîyo. Tîya de yewna derheqê tarîxê rojbîyayîşê Silê Qijî de nîqaş qewimîyeno. Goreyê belgeyî merdim eşkeno vajo ke Silo Qij serra 1916î de ameyo dinya. Şaîro bêmerg belgeyî de ano ziwan ke nameyê eşîra ci Mîlan o.

**Domanîye de kemane musaye**

Key ke Silo Qij 5 serrî bîyo, pîyê xo ra kemane musayo. Ê pîya şîyî veyveyan û merasîmanê îqrarî. Na çarçewe de Silo Qij wina vano: "Gama ke ma şîyêne veyve, mi kemane xelet cintêne. Pîyê mi hêrs bîyêne, dayêne mi ro û vatêne 'lawo rast bicine'. Badê ke pîyê mi merd, ez têna şîyêne veyveyan."

**Domanê Silê Qijî**

Akademîsyen Daîmî Cengîz nuseno ke demê Terteleyê Dêrsimî de Silo Qij zewicîyaye bîyo û wayîrê domanan o. Silo Qij dewamê ci wina zelal keno: "Serra 1938î de di lajê mi est bî. Ez rojêke şîya veyve. Uca de yew merdimo ke leşkerî ra ameyo de nêweşîya gerrî est bîya. Mi no gerr girewt. Domananê mi ra yew hîrê serrî bî, o bîn 6 aşmî bî. Ez ameya, keye de kewta ra. Ê domanan mi ra gerr girewt. Ez şîya, doktorî ra derman waşt. Oxina ke sey axûyî bîyo. Mi derman kerd pira. Domanan ra yew siba, o bîn zî şan de merd. Bado yew lajê mi Erzîrom de leşker bî. O dem Gimgim de erdlerz beno, o zî hetkarîye keno. Cemse tirr ra şona cêr û ey bi embazanê xo uca de mirenê."

**Şuwara Sayderi**

Seke zanîyeno erdlerzê Gimgimî serra 1966î de qewimîyeno. Cenazaya lajê ci Şah Haydarî (Sayder) anê dewe. Silo Qij verê cenaza de pê kemana xo rayra şino û Sayderî rê şuwareyêke vano.

Ewro zî na şuware şarê Dêrsimî dana berbayene. Nuştox Cemal Taş na şuware meqaleya xo ya bi sernameyê "Silo Qij Rest Heqîya xo" de dano. Şuware ra beşêko kilm wina yo:

*Dayê Erzurum o, kilê Erzurum o,*
*Sayderê mi cade şono,*
*Têlê Sayderê mi amo seba Tuncelî wiy biko,*
*Kam o, kes mi ra beyan nêkeno,*
*Vano havalo! Ti ke heqî nas kena,*
*Ti ke sona, pîyê mi rê derdinî rê vaje,*
*Bakilê mi efkâr meke, Sayderê mi ê eskerî yo,*
*Lajê to mekteb û taşil ra vejîyo,*
*Nê cîgerê to xizmetê xo kerdo,*
*Teskeraya mi qumandanîya ordîya 3. kerda pirr,*
*Ax! lajê to meste haw yeno,*
*Sayderê to haw meste yeno,*
*Vernîya sima hazir o nêro,*
*Waxto ke tabuta vosnê min ê qerî arde, şîya baxçeyî de nêro,*
*El û qom amê, Sayderê mi ser berbenê,*
*Adir kuwto kemer û dare ser de,*
*derdê cîgerê mi rê vêseno…*

**Kemane Silo Qij xelisna**

Çarenusê Silê Qijî bitaybetî wextê Terteleyê Dêrsimî de xeylê balkêş o. Kemana ci çarenusê ey dîyar kerdbî. Silo Qij pêvînayîşê ci yê bi Cemal Taşî de vano ke leşkeran o berdo qerekol. Uca de Pulur ra yew çawiş est bîyo. Nameyê ci Şukru bîyo. Leşkeran waşto ke Silê Qijî bikişê, labelê nê çawişî destûr nêdayo. Çawişî vato ke o şaîr o û kemane cineno. Silo Qij bado ca bi ca, alaye bi alaye fetilîyayo, leşkeran rê kemane cinita û kilamî vatê. Leşkeran zî reqs kerdo. Nê konteksî de Silo Qij wina qisey keno: "Nan û sola pî û kalikê şima bo, ez sayîya kemane ra xelisîya. Hênî nêbîyêne, înan ez zî kiştêne."

**Edene ra ver bi Dêrsim**

Goreyê zelalkerdişê Daîmî Cengîzî Silo Qij serranê 1950an de Edene de mend. Labelê uca de zêde rehet nêbî. Çike hertim bîrîya Dêrsimî kerdêne. Bi nê hawayî bira agêrayîşê bi Dêrsimî daye. No dem domanê ci yo qijkek mireno.

Silê Qijî rê zaf dejêko giran beno. O wazeno ke meyîtê domanê xo bero Dêrsim. Labelê hetê ekonomî ra rewşa ey rind nêbîye. Peynîye de çareserîyêke dîye. Meyît mîyanê doşekî de pîşt û sey cila bagajî da otobuse. O, laj û cinîya ci mabênê xo de qerar da ke otobuse de nêberbê. Ganî ramitoxê otobuse çax nêkero. Heta garajê Xozatî yê Xarpêtî nêberbayî. Uca de cinîştî otobusa Dêrsimî. Cinîya Silê Qijî na rey xo nêgêna pê û fîrqefîr berbena. Netîce de cenaza domanî ameye berdene bi Dêrsim.

**Dêrsimijan ra razî yo**

Badê cû Silo Qij şîyêne veyveyan û debara xo zafane bi kemana ci kerdêne. Gama ke o şîyêne şayîyan yan veyveyan, uca de keyf û kelebut bîyêne. Hunermend Ferhat Tunç zelal keno ke înan domanîya xo de têna seba nameyê Silê Qijî şîyêne veyveyan.

Senî ke kemanecen çimanê şarê Dêrsimî de rûmetdar bîbî, hende zî şar çimanê Silê Qijî de rûmetgiran bîbî. Şaîrî pêvînayîşê bi Daîmî Cengîzî de wina vatbî: "Ez şarê Dêrsimî ra zaf şa ya. Ez merdimêko feqîr bîya. Mi domanê xo bi pereyanê ke dêrsimijan seba karê muzîkê mi dabî pîl kerdî. Heq înan ra razî bo. Ez naye caran înkar nêkena."

**Silê Qijî dinyaya xo bedilnaye**

Şaîr û kemanecen Silo Qij 14ê kanûna 2019î de şî heqîya xo. Mezela ci dewa Milanî de ya. Ey peyê xo de kilam û şuwarayê qedrberzî verdayî. Zerrîya şarê kurdî de heta peynîya dinya do bicîwîyo.